

# ROJANÛ

*kovara huneri çandi û edebi*





## NAVEROK

Ji Xwendevanan . . . . .	3
Dî 20 saliya mîrîna xwe da Ernesto Che Guevera . . . . .	4
50 Saliya Serhîldana Dersimê . . . . .	6
Çiroka "Xudmuxtariyê" û Belge . . . . .	11
Çend Çarin - BARAN. . . . .	14
Sayi (helbest) - VAZGAL . . . . .	15
Ulmdar û Bajarvanê Mezin Orbelli	
Prof. Şekroyê MIHOYÎ . . . . .	16
Ji Folklorê Me (Straneke Govendê). . . . .	19
Welat lî dilê min e - Ç. GALEMTERYAN. . . . .	20
Gotmên Pêşyan . . . . .	23
Şikefta Bî Xwin (Serpêhati) . . . . .	24
Ji Nav Edebiyata Cihanê, Pûşkin - Emerikê SERDAR. . . . .	27
Quncikê Zarokan . . . . .	28
Ji Nav Weşanan. . . . .	30

Sal : 9

Hejmar: 62 Sibat 1988

*Wêneya Qapaxê: Ji bo destana Memê Alan —M. Delioglu*

**XWEDÎ : KOMKAR - Swêd**

**BERPIRSIYAR : Şeroyê BOTAN**

**NAVNIŞAN : Döbelnsgatan 16 B**

113 58 STOCKHOLM

**TELEFON : 08/ 32 82 51**

**HESAP NO : PG. 458980 - 0**

**UTGIVARE : Svensk-Kurdiska**

*Arbetar Föreningen*

**ANSVARIG UTGIVARE : Ş. BOTAN**

**ADRESS : Döbelnsgatan 16 B**

113 58 STOCKHOLM

**TELEFON : 08 / 32 82 51**

**PG : 458980 - 0**

LEYLA SOR

Bilind rind û çavreşa min  
Bejna te mêji bir ji min  
Ew bejn û balaya delal  
Bî dil bimeş were cem min.

Tu weri ezê jin bîbim  
Bî hêl û bî hîner bîbim  
Ew hez û tev evina te  
Bî mal û ez tîm jin bîbim.

Ezê binkim ew guliyê mor  
Maçek bîkîm ji lêvê sor  
Bejna te weki kulilkan  
Tevda gewr ew kesk û sor.

Tu neyi ezê din bîbim  
Bê hêl û bê hîner bîbim  
Jî ber evina te delal  
Bê Xwuda bê hêvi bîbim.

Tu neyi ez dikevime ciyan  
Beşek xwar ji dînya çavan  
Dîkîm nalin ji derdê dîlan  
Janekê xwe berda milan.

Feqîr bankîr tu neyi malan  
Te lêxist remzek lî milan  
Ew agir û şewata te  
Xwe berda gurçîk û milan.

Feqîr AHMED

\*

Jî kovara hêja Roja Nû re:  
Pîştî rêz û silava.

Sala we ya nû pîroz be. Ez  
hêvidar im ku ev sal jî kovara  
Roja Nû, gelê me û hemû gel-  
lên dînyayê re bî xêr û xweşî  
bê.

Jî bo sersala 1988'an ez  
helbesteke xwe jî we ra dîşî-  
nim û jî bo helbesta min a ku  
we belavkiriye jî ez spas dî-  
kîm.

Brader AMED  
Fransa

Jî kovara Roja Nû Ra:

Ez keçeke Kurd im. Ez heft  
salî me û lî Elmanya Federal  
dîjim. Ez serê sala we bî dîl û  
can pîroz dîkîm. Daxwaza  
min ew e ku hûn hê jî zahftir  
jî bo zanebûna zarûkên Kurd  
binivîsin. Min dî "Roja Nû"  
hejmara 18'an da, dî "Quncî-  
kê Zarokan" da gelek tîştên  
ku min bî kurdiya wan nîza-  
nîbû xwendin û hin bûm.

Ez silavên bî başî  
lî we dîkîm.  
H.T.

Elmanya Federal

\*

NALÎNA KEVOKAN

Jî pêşmergeyan ra

Jin sext û girane  
Aman! Jî derdê vê dinê  
Dînalîn kevokên reben  
Ay wax lî minê  
Jî bo hêlinokê  
Hêj çî hawarek  
Ne hatiye perijandîne...

Rêkên xebatê  
Tari û dirêj in  
Kevok jî lew re  
Din û gêj in  
Jî bo hêviyê  
Dîrist dîkîn awaza,  
Stîrana dibêjn...

Bî silavên min re  
xwişka we Ofra DORA  
Yewnanistan

Jî Redaksiyona Roja Nû ra:  
Hevalên hêja,

Ez dîxwazim "Roja Nû" her-  
dem bî destê min keve. Lema  
lî jêr ez navnişana xwe jî we  
ra dînivîsim. Ez hêvidar im ku  
hûn herdem jî min ra bîşînin.  
Ez jî we ra kasê teke xwe dî-  
şînim, ku hûn zêde dîxwazim  
min hayedar bîkîm.

Silavên dilgermi û hevalti.

H. BARAN

\* Elmanya Federal

Jî Redaksiyona Roja Nû ra:  
Ez xwendevaneki "Roja  
Nû" me. Ez dîkarim bêjim ku  
heta niha hejmarên berê dî  
wextê da dîgîştînin destê min  
lê hejmaraa 18'an dereng gi-  
hişte destê min, çîma?. Bî ras-  
ti dereng hatîna kovarê  
wek xwendevaneki ez êşan-  
dîm.

Tîştêki dî jî; dî hejmara  
dawiyê da hûn dibêjin ku du  
ferhengên kurdi derketine. Lî  
kuderê merw dîkare bîkîre?.

ROJAN

Elmanya Federal

AGAHDARI

Jî bo bîdestxistîna ferhen-  
gan navnişan ev in:

\* "Ferhenga Kurdî-Tirkî", D.  
Îzolî:

KSSE - AFD NEDERLAND  
POSTBUS 16109 Den Haag

\* "Ferhenga Zazakî-Tirkî",  
Malmîsanîj:


JÎNA NÛ FORLAGET

Post Box: 240 12

750 24 UPPSALA/ Sweden  
(Postgiro: 503799-9)



Dî 20 saliya mırına xwe da lî hemû dinyayê  
hate biranin



**ERNESTO**  
**“CHE”**  
**GUEVERA**

Dema ku mirov navê Ernesto Che Guevara bî bir tine, berya her tîştî internasyonali, welatperwerî û fedakari tê ber çavê mirov. Emrika Başûr (Emrika Latîni) gav bî gav şahîdiya vi tekoşerê bêtiş dîde û kê mî cih hene ku vi canfedayî nasnekirîbîm. Dî pêşengiya şoreşa Kubayê da, lî çiyayên Bolîvyayê, lî Guatemalayê, Venezuellayê, Ekvatorê, Meksikayê, welatê wi -Arjantinê û wd. da kar û xebata vi şoreşgerî bûye destan, bûye berxwedan. Ev çend rêzên Che, ku iro lî dîne bûye banga berxwedanê lî hember zorkeran, û imperyalîstan, wê jî me çêtir wi bîde nasandî:

"Mîrî jî kuda  
û çawa tê bîla bê...  
Eger dirûşmên me yên şer  
guh bî guh belav bibe  
û çekên me jî destan derbasi destan bibe  
û kesên dî nî bî dengê mitralyozan  
û bî şer  
û bî qirînên serketîne  
jî cenazeyên me ra stran çêbike  
mîrî bî xêr hat  
bî xweşî hat."

Jiyana Che, jî zarotiyê va tîm bî hereket bûye. Hê dî du saliya wi da mîrî lî dû geriyaye, bin lê çikandiye, lê ev internasyonalîstê mezin gelek caran kefen çirandiye û jî mîrîne ra meydan xwendîye.

Ernesto Che Guevara, dî 14'ê Hezîrana sala 1928'an da lî Arjantinê lî bajarê Rosario hate dîne. Hê du salî bû, nexweşîna astîmê pêgirt û ev nexweşî heta mîrîne dev jê berneda.

Malbata Che, dewlemend bû lê xwedî dîtinên liberal û pêşverû bûn. Bavê wi Ernesto Guevara Lynch, muhendîsê bîlînd û bî eslê xwe jî Îrlandî bû. Diya wi Celia de la Serna jî, bî eslê xwe niv-Îrlandî niv-Îspanyolî bû.



Malbata Guevara ji ber nexweşina Che gelek cih geriya û sal bî sal, hal û wextê wan nebaş bû. Jî ber vê nexweşinê mirov dikare bêje, ku Che xwendina dibistana yekem di mala xwe da kuta kir. Di sala 1944'an da Lisê, di 1953'an da jî, Fakulta Doktoriyê kuta kir û bû doktor.

Piştî diploma doktoriyê, jî bo ku li Venezuellayê li koloniyek cuzzaman bixebite, berê xwe da Venezuellayê. Divê mirov jî bir neke ku Che, di dema xwendevaniya fakultê da hema bêje seranserî Emrika Başûr geriya bû û gelek tişt naskiribû. Di rêya Venezuellayê da, berê xwe guhast û çû Perûyê. Li Perûyê pirtûkeki wi, ku bi naveroka xwe Perûyê ya cîvaki dida ber çavan, hatibû çapkirin (di dema xwendevaniya wi da). Jî ber vê pirtûkê, li Perûyê hate girtin. Di hepsê da bi şoreşgerên Perûyê ra têkiliyên germ dani. Piştî ku jî hepsê derket, berê xwe da Ekvatorê û li wê derê rasti Avûqat Ricardo Ro-

jo hat, ku ev hevnasin jî bo jiyana Che, bû serdemek. Ricardo Rojo, jî Che ra weha got: "Tê herî Venezuellayê çî biki? Erê, wê derê jî bo qezenckirina pera ciki baş e, lê eger tu bî awê min biki bî min ra were, em herin Guatemalayê. Li wê derê şoreşeke cîvaki ya rasti heye..." Ev gotinên han, bandoreke mezin li ser Che peyda kir û Che deş jî çûndina Venezuellayê berda.

Li Guatemalayê, jî aliki va li karê doktoriyê geriya, jî aliki va jî, jî bo domandina jiyana xwe dîcedand. Di vê navberê da li Guatemalayê hukumeta şoreşger ya Arbenz, bi tiliya imperyalistên Emrika hate hilweşandin û hukim ket destê kevneperestan. Che, naçar ma xwe avêt bextê balyozxana welatê xwe. Di vê demê da, jî ber kar û xebatên wi yê rêxistinî, hukumeta Guatemalayê gav bi gav lê digeriya. Jî ber vê yekê Che, şevêk bi trêneki jî Guatemalayê berê xwe da Meksikayê. Che, di dema xebata xwe ya Guatemalayê da gelek Kubayîyan naskiribû û di vê navberê da birayê Fidel Castro, Raul Castro ii naskiribû.

Li Meksikayê wi û Fidel Castro hevdu naskirin û piştî vê têkiliyê wi berê xwe da pêşengiya şoreşa Kubayê.

Che, him di şoreşa Kubayê da him jî piştî şoreşê gelek wezîfeyên girîng da ser milê xwe û bû internasyonalisteki hezkirî yê dîmê. Di Kubayê da jî bo sazkirina sosyalizmê bî dil û can xebitî û gelek berpirsiyariyên mezin pêkani, wek Serokatiya Banqeya Netewî, Serokatiya Heyeta Bazîrganî, Wezîriya Sanayîyê û wd. Di vê navberê da li gelek welatên paşdamayî geriya û rewşa dîmê çêtir naskir.

Di Îlona 1965'an da jî hemû wezîfeyên xwe dest kişand û jî Kubayê veqetîya. Berê xwe da Emrika Başûr, lê kesi nizanibû bî kuda çuye. Heta du salan tu his û dengê jê derneket û herkes wi mîrî dizanibû. Piştî du sala, di sala 1967'an da nameyek şand Konferansa Havanayê û bi vi awayî dinya pê hîsiya ku Che sax e. Di dema windabûnê da Che, li Bolîvyayê bî karê şoreşê mijûl dibû.

Mîrî, li Bolîvyayê li dorhêla Higueraşê wi qefalt. Eskerên Barrientos yê xwefiroş di 7'ê Çîriya Pêşîn a 1967'an da dor lê girtin û piştî berxwedanek qehremani, ew bî birindari bî dest xistin (8.10.1967). Di dema pîrsiyari (îfade girtin) da jî, tevi halê ne hal serî jî dijimî xwe ra danani û tîfîr rûye generalê wan. Di 9'ê Çîriya Pêşîn (1967) da bî destê Çawîş Mario Terzan bî makineliyê hate kuştin.

#### ERNESTO CHE GUEVARA

*Gulek ket li çiyayên And*

*Dilê min wi bipêçe*

Kemal BURKAY

*Bipêçe ku bila bîji rindî*

*Bila bîji camêri, rasti, bedewti*

*Bî usûl bipêçe, ew duweroj e*

*Bîşku vedibe, dibe Guevera*

*Av diçe dibe Guevera*

*Dewran tê dibe Guevera*

*Ezman, ezmanê bêdawi, yê me hemûyan*

*Ger bîzanî dînya, ya me hemûyan*

*Hezkirin û jîyan bî dileki*

*Menewşên ku bî dîlopek xwîn dareki çînarê*

*Û dîkevin erdê*

*mezin dîkin*

*Rojek ku zîncira dawî şikiya*

*Ku dînya gîha aşîtiyê*

*Bînî bîra xwe, di pelgên çînarî da*

*Çavên Ernesto hûn bîbinî*

*Xwîna wi hebe di sorgulan da*

*Xezalek diçêre, gur dîzûre*

*Perpoz digre zînar*

*Li hemû çiyayên dînyayê, jî bir ne kî*

*Dengê solên Ernesto wê hebin*

*Bîşku vedibe, dibe Guevera,*

*Av diçe dibe Guevera*

*Dewran tê dibe Guevera*

*(Ev şîer, jî kutêba "Dêrsim" jî Tîrki*

*hate wergerandin)*



# 50 SALIYA SERHILDANA DERSIMÊ

## II

*Wergerandin ji Riya Azadi, hejmar 107: DILSOZ*

Tekoşina sala 1938'an ya heri zor û çalak qewetên Demenan nişan dîda. Dema ji sê aliyan hatin hesarkirin jin û zarok zêtir berbî paş vekîşandibûn Newala Laç. Dî vê navberê da ji navça Ovacixê ji eşira Kalan û eşirên din, bî hezaran kes reviyabûn û tevli wan bûbûn. Dema ku hêzên eskerî ji bo belavkirina qewetên Newala Laçê ji eniyên çiyayê Sor û Petereyê êriş li ser êrişê dikirin, qewetên Demenaniyan dibêrxwe dîdan, qehremaniyên nedîtî nişan dîdan. Ew havin, heft êrişên mezînan hatin şikandin, xîsarên mezînan gîha dijmin.

Destpêkirina salên Serhildana Dersimê, di eyni wextê da salên Şerê Îspanya ya hundurî bû ji. Wê demê qewetên Cumhûriyetparêz, ji bo ku faşîstan nekî serbajar-Madridê berxwedanek qewî nişan dan, qehremaniyên destanî peyda kirin. Her wisa Newala Laçê ji, ji bo gelê Kurd Madrid bû. Bî ferqiyek, slogana Cumhûriyetparêzan "No Pasaran" (nîkarî derbas bîbî) ji alî hemû dînyayê va di hate bîhistin; lê li Dersimê bî mehan slogana "nîkarî bîkevî Newala Laçê!" ji xeynî çiyân, newalan, zînanan pêştir kesî nebîhist.

eEv şerê mezînan yê dorhêla Newala Laçê, ew berxwedana bî şan û şeref ya gelê me, di nîveka meha Tebaxê da hate şikandin. Bî hezaran jin û zarokên wir bî gullekirin, bî sîngûkîrî hête qetîkîrî. Bî sedan kes ji, ji bo ku nekevî destê dijmin û dil nebî, xwe ji geliyan avêtî xwar, xwe avêtî ava Munzur. Ordîya Tirk pîr insan kuşt, ku çem sor bû, bî cendekan tîji bû.

Ew berxwedan ji wê rojê heta îro, yênan ku alîgirê serhildanê bî yan nebî, ji eşira Demenan xweş bî yan ne xweş bî, ji alî herkesî va bî pesînan tê behskîrî.

Ev şerê ku di navbera Zel û Çiyayê Sor da hate domandin, nişanda ku li Dersimê ne tenê xwefiroş û karbidestên wek Rêber, kurê Pîrço, Sîlo Axa nejiyane; her wisa ji, nişan da ku mirovên wek kurê Seykali - Îvis (Îvisê Seykali), kurê Gewê - Hesên (Hesê Gewê), kurê Hesên - Qemer (Qemerê Hesên), Kalê Gonc, Eliyê Bîçûk (Eli Oqîz), kurê Cebrail - Ehmed (Hemê Cîvê Kêj), Mirzo, Sîlê Pîr û Besa Şayê û bê hejmar qehremanên bênav û deng ji hebûn.

Bî stendîna Newala Laçê Serhildana Dersimê





hatibû şikandın. Gerçi şervanên Demenaniyan yên ku xelas bûbûn xwe nedabûn dest û li çiyay berxwedan domandin, lê tevger, bî pîrani qeweta xwe wînda kiribû.

Dema ku li Dersimê ev bûyerên han dibûn, Serokwezîrê Tirk Celal Bayar li Stembolê bî M. Kemal, li Enqerê ji bî İsmet İnênû ra peyivî û dûra tevi hinek wezîran û Serekê Qurmaya Giştî Mareşal Feyzi Çakmak ketin rê. Disa dî eynî rojan da dî rojnamên Tirk da, ku dî derheqê şerê du salan da bî hesasiyet tiştê nedînvîsin, mirov rasti nûçeyên wek "hêzên ordiya 3. yan li navçê manewra dikin" dibû.

Dema ku Celal Bayar li Dersimê bû, ango he ma piştî serhildanê ordiya tirk dest bî qirkirinekî mezin kir. Ne tenê mirovên ku xwe li çiyay û daristanan girtibûn, kesên ku qet beşdari serhildanê nebû bûn û li gundê xwe li ser îş û karê xwe bûn û alikariya dewletê kiribûn ji, jî vê qirkirîna para xwe girtin. Hetta yên ku dî vê rewşê da bûn, pîri caran jî eşîrên şerkîrî zêtir û meztir xesar ditin. Lewra dijmin, wana bêhay (xafil) qefalt. Eger em çend minakan nişandin wê baş be.

Rêber Kopê "dostê" hukumeta Tirk, ku dî şikandina serhildanê da xwedî roleke mezin bû, dî 1938'an de di gel perên ku stendibû li Rojava (Tirkîyê) ji sozê gomeki (Çiftlig) dabûnê û jî bo ku here ser vi erdî, çû ba fermanarê Kolordiya Hozatê. Rêber got qey wê fermanar disa wek rojên berê wi qebûl bike, lê, him ew him jî kesên malbata wi, bî gullekirîna hatin kuştin û dest danin ser perê wi.

Wek ku dî beşên nivîsê yên berê da jî hate xuyakirin, aqûbeta serokeşîrê Ferhadan Cemşid Axa û serokeşîrê Qerebalan Kangozade Mehmed Eli, ku çekên xwe teslim kiribûn û bî hukumetê ra peyman çêkiribûn, jî yê Rêber cûdatir nebû. Ne tenê ew û malbatên wan her wisa eşîrên wan jî, bî giştî xesarekê grîtan ditin. Eşîra Kirgan jî, du sal ser hev bî her awayî alikariya hêzên eskerî (yên Tirk) kiribûn, dî qirkirîna 1938'an da Salmanê Şatoxi û kesên malbata wi li Hozatê hatin gullekirin. Jî yên mayin, qismek jê hatin kuştin, qismek jê hatin nefikirin.

Jî malbata Silo Axayê serekê eşîra Alan, ku bî fermanarê hêza tirk - Eli Heyder ra destbiraki danibû, kes nefiltî, hemû hatin kuştin. Van



kiryaran dî dema terfîkirina Eli Heyder da, ku jî albaiyê terfî kir bû general, çêbûn. Bersiva xizmeta eşîra Areyan jî, bî eyîni şiklî hate dayîn û gelek qurban dan. Torîne Mamed Axayê serokeşîr - Suleyman, bî rasthatîni (tesaduf) canê xwe xelas kir.

Jî eşîra Hormek Bertal Efendiyê serekê mîntîqa gundê Cıvîrikê, bî hukûmetê ra tu nakokiyek xwe tune bû. Bî serda jî, îhala kışandîna êmê dewarên hêza sıwari û barkêşîya mîntîqa şer sitendîbû ser xwe û du sal serhev vi kari kirîbû. Dî qırkırîna 1938'an da lî dorhêla Nazmîyê hate kuştîn, êriş çû ser mala wi û 66 nufûsên malbata wi hatîn qetilkîrîn.

Zeynel Çawîşê Kurêşani, kiryarên ku jî alî dewletê va wek eşqiyatî dîhate bînavkîrîn dîkîr. Dema ku dî 1937'an da tevgera eskerî destpê kir, dewlet pê ra lihev hatîbû û wi sitendîbû ba xwe. Zeynel Çawîş, bî hêzên eskerî (dîjîmî) ra alîkariyekî mezîn kirîbû. Lê dema ku berxwedan hate şikandîn û qırkırîna 38'an destpê kir ew û kesên malbata wi jî, jî kuştîne xelas nebûn.

Tu sûcek bîneciyên gundê Halvori tunebû. Bî serda jî, jî serekên gund - Mîstê Surê, lî hember Demenaniyan hevkarîya esker (dîjîmî) kirîbû û jî wan ra xizmetên "baş" kirîbû. Mîstê Surê, dî 1938'an da lî rîya Hozatê hate kuştîn, bîneciyên gund jî, "wê fermandarê Tumenê were, wê jîmartî çêbibe û wê kaxîzê azadiyê bîdîn we û hûnê serbest bîbîn", bî vi awayî hatî xapandîn û wan bîrîn ser zîmarên raserî Munzurê, dûra jî gullebaran kîrîn û wana avêtî Çemê Munzurê. Yê ku lî wê derê hatî kuştîn, 380 kes bûn.

Rojek bî sibê ra, hêzên eskerî dora gundê Xeç dîgîrîn, bî ûcba "şandîna nefiyê" gundîyan lihev dîcîvîmî û lî raserî gund dîdîmî ber gullan. Hejmara kuştîyên wê derê 370 kes bû. Berya Xeçîyan jî, teqrîben niv saet berê û hema lî raserî wan bîneciyên gundê Zîmîk -gundê Hozatê-, bî eyîni şiklî hatîbûn kuştîn. Gundîyên Tavûxê, dî geliyekî da hatîbûn terakîrîn û qetilkîrîn. Lolan Tanêrî, lî malan hatî qolîmçekîrîn û bî agirberdanê hatî şewîrandî. 17 zîlamên Wartînikê, nêzî Axdatê lî hêla Çala Keran dî çalekî da hatî qolîmçekîrîn, ser wan sapên genîm hate kêşkîrîn û bî wi awayî hatî şewîrandî. 70 mêr û jînên Heyderaniyan lî cîyek bî sîngûkîrîne hatî qırkîrîn. Lî Boxaza Eli 70 mêrên Qozûyê,

ku xwe dî Şikefta Guran da vedîşartî, dî barana bombeyên destan, bî gullebarankîrîna mîkînelîyan hatî qetilkîrîn, ku qatya şikeftê hatîbû qulkîrîn û jî vê qulê bombe reşandîbûn. Mîrovên ku jî gundê Êresk hatî gîrtî, lî Derê Çîr da hatî gullebarankîrîn.

Helbet mîrov dîkare bî sedan, bî hezaran mînakên weha bîbîne û bîjmêre. Lê ewqas hewcedarî tune. Ev çend mînakên han jî, têrî eşkerekîrîna qırkîrîna bî xwîn lî Dersîmê ya Dewleta kolonyalist a Tîrk dîke.

### BEREVAJÎKIRINA RASTIYÊN SERHILDANA DERSİMÊ, XELETIYÊN ŞIROVEKIRINÊ

Bî her awayî hînbûna ev bûyera 50 sal berê, eşkere ye ku gîranbuhayîyeke mezîn e. Gelê me yê xebatkar, mîrovên me yê welatperwer wek serhildanên dîmî dîvê lî ser vê serhildanê jî serê xwe bîêşîmî, jê dersan derxî. Van dersan, jî bo serfirazîya tekoşîna gelê me, ku lî hember dîjîmî kolonyalist dîmeşîne, lazîm û pêwîst e.

Wek me dî destpêkê nîvîsê da jî da xuyakîrîn, dî Tîrkîyê da hejmara pêşverû û demokratî ku hêj jî dî nav çarçeva dewleta kolonyalist da ne û bî wê çavê lî serhildana Dersîmê dînerî, bî çavê burjûvazîyê dîmeyîzîmî gelek zêde ye. "Lî dersîmê eşqiyatî hebû, jî ber vê yekê ordî hate seferberkîrîn" yan jî "jî ber berxwedana axayên ku lî hember reformên Kemalist bûn van bûyeran lî Dersîmê derket holê", beyan û şîrovekîrînen weha îro jî tene kîrîn. Lî welatekî ku jî dervayî pêşandîmî fermî, eşkerekîrîna bîr û bawerîyan qedexe bûbe, pêşandîna bûyerekî weha gîring, ku bî kuştîna dehhezaran insan kuta bûbe, bî awakî ser ra û sedemên besît ra gîrdana wan dî nuqteki da normal e.

Dî eslê xwe da xwedîyê van fîkran, hebûna gelê Kurd û welatê wi davên piştguhên xwe. Ew, pêwîstîya mafên demokratî ya netewî ya gelê me hêj jî qebûl nekîrîne. Dema rewş weha be, destnedana yekbûna dewleta nîjadperest û kolonyalist, wek tîşteki pîrozkîrî nîşandana wê, disa wek propagandeya kolonyalîstan sîcdarkîrîna azadîxwazan, jî bo yê weha ne zehmet e.

Eşkere ye ku, eger lî cîkî dewletekî hînek welatên dîmî kîrîbe bîmî destê xwe, çavkaniyên sererd û bînerdên wan welatan talan bîke, xwedîyên wan welatan wek kole mecbûrî jîyanê bîke, lî hember wi tekoşî, serhildan her wext mafekî rasteqîn e. Ev, lî koloniyên dîmî yê dînê, lî Afîrîqa û Latin Emrîka çewa be, lî Kurdîs-



tanê ji her wisa ye. Ji ber vê yekê tu kes nikare serhildana gelê me ya li hember dewleta Tirk a dagirker sûcdar bike, barbariya vê dewletê nika-re bi hinek sedeman rûsîpi bike.

Lî ali dîm bi gotîna "ji ber berxwedana axayên ku li hember reformên Kemalîst bûn van bûyeran li Dersimê derket holê" û ku li ser vê gotinê serhildana 1937 - 38'an tevgerê kevneşopi bête ditin, ev, ji rastiyan ra çavgiştin e. Yê ku viya dibêjin, yan raste-rast berdevkên burjûvaziyê ne, yan ji ew kesin ku bandora propaganda burjûvaziyê ji ser xwe neavêtine.

Gotin hatiye ser meselê, divê em car dîm binê vê rastiye xet bikin: Hukumeta Mistefa Kemal ji, hukumetên burjûva yê pîştî wi ji, tucar li Kurdistanê ji bo pêkanîna reformekî serê xwe neşandine. Tam tersê wi, ji damezrandina Komarê vir da kolonyalist bi feodal û kevneperestên Kurdistanê ra hevalbendiyê xurt ajotîne. Ev minak bi serê xwe dide nişandan, ku dijayetiya hemû cûre reform û pêşketînan hatiye kirin. Ji ber vê yekê, nakokîya navbera feodal, serokeşîrên Kurdistanê û M.Kemal ne ji ber daxwaziya reforman e, ne ji dijayetiya reforman e, tersê wi, dijayetiya hinek feodalên Kurd û serokeşîran, ku li hember kiryarên nijadperest-kolonyalist û terorîst ya hukumeta Tirk li Kurdistanê, ji bo cehdkirina rîzgariya Kurdistanê ye. Yani, ew dorhêlên ku li hember "reforman" derdiketin, di esli da bi daxwaziyên xwe yê berbiçav ji hukumeta burjûva ya Enqerê pêşdatir bûn.

Disa "li Dersimê eşqiyati hebû, xerabkirên asayîşê hebû, ji ber wê yekê dewlet hewce dit ku esker sewqê wê derê bike", ji bo şirovekirinên weha ji tiştê ku wê bête gotin eynî ye. Berya her tiştî yê ku çewa li hemû Kurdistanê wisa ji li Dersimê eşqiyati dikir, dewleta Tirk bi xwe bû. Ji dewletê, ku wek hedef li qirkirina gelê Kurd bigere, heri daxwaziyên biçûk bi xwin bifetîsine, buhayiyek nede jiyana insan, talanker û dagirker be, gelo ji wi mezintir eşqiya heye?

Lî ali dîm, qêy li Dersimê şerê navbera eşîran, dozên xwinê, rêbirin û bûyerên weha tune bû? Helbet hebû û helbet ev rewş di seri da gelê Kurd dixesirand. Lê hebûna van bûyeran, kiryarên dewleta kolonyalist rûsîpi nake. Çarelêkirîna pîrsgirêkên welatê me, kar û wezîfa gelê me ye, ne yê kolonyalistên Tirk e.

Eger em li Kurdistanê tevgera dewleta Tirk rûsîpi bikin, ev heqê han bîdîm wi, ew çax divê em, kiryar û dagirkeriya koledar û kolonyalistên

çaxa kapitalizmê, dewletên emperyalîst, ku bi navê "medenîkirina hovan", "sererastkirina nîzamê" welatan zêft dikin, wek rasti qebûl bikin, wi bîparêzîm. Divê mirov ji bir neke, dema ku emperyalîstên Emrikani li Vietnamê şerê bi qîlêr didomandin, digotin ku ew ji bo azadi û heqên mirovi li wê derê ne.

Îca qêy "eşqiyati", "tevgerên bêqanûni" tenê li Kurdistanê hebûn? Qêy kiryarên weha li Egêyê, li Behra Sîpi (Akdeniz) û li Enedola Hundir yan ji li hêlên dîm tune bû? Çima dewlet li wan dera ordiya xwe seferber nekir û bêyi mîzekirina emir, cinsiyet qetliyam nekir yan ji bi dehhezaran insan ji erdên wan dernexîst û neşand nefiyê? Helbet, em, nabêjin ku li ser mirovên van dorhêlan zordestî û kedxwari tune ye. Bê şik dewleta burjûva, li kuderê dibe bila bibe li ser xebatkaran kedxwari dikir, zordestiyê didomand. Lê, divê mirov kiryarên cûda yê rejîma nijadperest-kolonyalist, êrişên wi yê qirkirîna li Kurdistanê bibîne.

Îca riya "dijayetiya eşqiyatiyê" cezakirina insanên bêşûc, şingûkirina herkesî -ji zarokên dergûşê bigre heta tîfalên zikê dayikan-, gullebarankirîna, di xaniyan da bi komîti şewîrandina xelkê, ji geliyan da terakirîna, di şkeftan da bi bombebarankirîna nine herhal.

Vana hemû nişan dîdîm ku bi rasti niyeta dewleta Tirk ne sererastkirina asayîşê bû û ne li dû tiştêki weha bû ji. Jixwe cehda xwe baş eşkere dîke, ku ew nakokiyên navbera eşîran, dozên xwinê kîş dikir, di bin da mîrkuji dikir, yani tiştên ku bi dev "dijayetiya" wan dikir yekcar li hev sor dikir û li berdewamiya wan nakokîyan dîcedand. Îca gelê me, rastiya ji nêz va, baş nasdîke, ku dewleta Tirk ji bo xêrxwaziya xwe çawa "dostani" bi kesên "eşqiya" ra ji dîke. Berya bûyerên Dersimê û di dema destpêkirina bûyeran da, ki nîzane ku bi dehan, bi sedan mîrkuj, talanker, rêbir ji ali dewleta navdar va dihatin perûkirin û bi rûmetkirin? Gelo eynî rewş iro ji, dom nake? Disa pîştî qetliyama Dersimê carna van gotînan, "Haya Ataturk û İno-nu ji viya tune bû, evya karê Celal Bayar e", yan ji "Haya mezinên dewletê ji van kiryanan tune bû, evya karê fermandarê Dersimê ne", "Mereşal Fevzi Çakamk çewa hat Dersimê, qetliyam da sekinandin, berê xwe da fermandarên ku van kiryanan kirîye", dihatin belavkirin. Evya, dezge û propagandeya dewletê ya veşarî û bi sistem bû. Armanca ew bû, ku dewlet bête rûsîpîkirin û sûcê qirkirîna bîkîm sitûyê hinek "niyetxerab" an. Divê mirov qebûl bike,



ku van propagandeyan bandoreki lı ser gel çêkır. İro ji, mirov dikare rasti mirovên bawerbû-yi yên van tıştan bê.

Eşkere ye ku kiryarên Dersimê ne tenê karê Celal Bayar, ne ji karê yeki dın bû. Evya, nişana siyaseteki bû, ku ji ali dewletê va hatibû hazirkırın û bı ci anin. Yên wek M.Kemal, İno-nu, C. Bayar û Fevzi Çakmak, ku mezmên sere ke yên dewletê bûn, dı dereca yekem da gunehkarên vê qırkırîmê bûn. Dıvê mirov eslê çavkaniya qırkırîna Dersimê dı van gotmên M. Kemal da bigere, ku Dersimê wek "bırineke ecêb xeter" dibine û "dıvê ew (Dersim) bête bışkaftın û avêtın, paqışkırın".

### HETA YEKİTÎ ÇÊNEBE AZADÎ PÊK NAYÊ

Lı ali dın Serhıldana Dersimê car dın nişan da, ku çaxa dijmnê kolonyalist zulm û zordariyê didomand ne tenê ordî , polês seferber dıkır, berya viya, ji bo berhevdana gel dıcedand. Berhevdanên Alewi-Suni dihatın peydakırın yan ji wana bı kar dianin; eşir û axayên ku berberî dı navbera wan da hebûn, beri hev dıdan. Binge-ha feodali û eşireti ji, ku lı welatê me serdeste, berê ji viya ra tım mecal peyda kır. Serokeşir, pêşevanên oli (dini) û axa, ji bo xêrxwaziya xwe bı dewleta kolonyalist ra, ku welatê me dı bın işxalê da dihelın, karbıdesti dıkın. Ew, tevi dewleta zorker keda gelê me dıxwın, wana beri hev dıdın.

Jı xeyni vana piştı ku gelek parti derketın rû, berberiya navbera partiyên burjüva ji bün serbarê ser. Dewlemendên Kurd, dı nav partiyên dijmnê gelê me da ci dıgirtın, ev rewş dı eyni wextê da rê lı nakoki û dijmnahıyan fireh dıkır û telefaten mezmın dihatın serê gelê Kurd ê xızan.

Disa iro, gava dijmnê kolonyalist dıxwaze û dıcedine ku dı navbera tevgera welatparêz ya Kurd da berhevdanê derxe, ji rojên Serhıldana Şêx Seid, Agiri û Dersim cûdatır rêyek najo. Ajan - prowaqatorên ku lı ser navê rızgariya Kurdistanê derketine holê ji, ji bo pêkanina planên dijmnın rolên xwe bı layıqi dıleyızın.

Ew çax, ji bo rızgariya welatê me û ji bo gi-handına jıyanek azad dıvê berya her tıştı mirov, lı hember planên dijmnın şıyar be, listikên wi pûç bike. Lı kuderê dibe bila bibe, dıvê em, lı hember berhevdanên eşiri û mesebi tewreki bı rik nişandın. Berberiyên menfeatparêzi yên ku



### ALİŞÊR Û JINA WÎ ZARİFE XANIM

dı navbera partiyên burjüva da domdıke, dıxwaze gelê Kurd ji hev parçe bike, wana beri hev de. Dıvê em bıcadının ku rê lı dabeşkırın û berhevdana gelê me bıgırın. Her weha rünedan û tenêhiştına hınekan ji, ku navê tekoşına rızgariya netewi lı dû xwe dıxın lê lı hember gel û rêxıstınên welatperwer çek dıxebıtının, wezifeki welatparêziyê ye. Dijmnın dıxwaze me ji hev bike, dabeş bike, dıvê em ji, lı xurtkırına yekiti bıcadının, lı hember xeletiyên derên û bı vê hawê bersiv bıdın.

### XILASBÛNA JI FIKRÊN EŞİRÎ GELEKÎ GIRİNG E

Dema ku dı derheqa Serhıldana Dersimê da nivisek weha hate pêşkêşkırın, em, lı ser başı û nebaşiyên cûre-cûre eşiran yên berya serhıldanê û dema serhıldanê sekinin. Bê guman armanca me, ne parastına hınek eşiran û gunehkarkırına hınekên dın e. Em, ji bingehi va diji eşirparê-



ziyê ne. Û em dîzanin ku evya astengiyeke giring e li pêşiya yekitiya gelê me. Di şerên navbera eşirên Dersimê da, di pêknehatina yekitiyeke xurt û fireh da derece bî derece berpîrsiyariya hemû eşiran heye û evya rastiyeki ye. Lê ev berpîrsiyari bêsîk ne yê mirovên belengaz e, ev, sûcê serokeşiran, pêşevanên eşiran e.

Kiryara tîştên baş yan nebaş, bikêrhatina tekoşina rîzgariya gelê Kurd ne grêdayi pevgrêdana eşirên bînavkuri ye, grêdayi zanebûna mirov, ceħda tekoşinê, daxwaziyê ye. Mumkun e, ku do eşireki yan ji hin kes ji eşirê li hember dijmin dîberxwe dabîn lê demek şûnda di ciyê xwe da bêdeng rûniştibin yan ji di sefên dijmin da ci girtibin. Her bî vi awayi mumkun e, ku eşireki demek bî dewletê ra hevalbendi kiribe û

paşê sef guhartibe, ji vê eşirê hinek kes yan ji bî tevayî beşdari şerê welatperweri ji bibê. Li vê derê tîştê giring ew e, ku mirov ji xeletiyên berê ders bigre û bîzanibe, ku gava galê me dafi berhevdanên eşiri û mesebî dîbin, dijminê kolonyalist, karbidestên wan roja xwe dîkin roj û bêyi tu ferqiyeki keda gel dîxun.

Dema ku em di 50 saliya serhildana qehremananê Dersimê da bî dehhezaran şehidên wê bî bir tînn, wezifa me ya esasi ewe ku em van rastiyan bîbin û bî hêz û daxwazê xurttir mil bîdîm tekoşinê. Gîramiya şehidan, ji riya bilindkirina alaya tekoşina rîzgariyê derbaz dibê.

DAWÎ



# ÇIROKA "XUDMUKTARIYÊ" Û BELGE...

(22.7.1338 (1922))

Ji Femandariya Eniya Elcezîre ra talimata Heyeta Wekilên Meclisa Miletê Mezîna ya di derheqa Kurdistanê da.

1- Gav bî gav di hemû welat da û di çapek fireh da li cihên ku pêwîstî hebe û tebeqeyên gel lê xurt in, çêkirina xudmuktariyên navçeyî (mehellî) ji pêwîstiyê siyaseta me ya hundir tê. Em pêwîstî dibînin ku li mintiqeyên Kurdan ji, ku him ji alî siyaseta me ya hundir him ji ya derva, di vê gav bî gav xudmuktariyên navçeyî bête sazîrin.

2- Prensîba Mafê çarenûsî, li hemû dinê hatiye qebûlkirin. Me ji ev prensîba qebûl kirîye. Wek ku tê texmînkirin, ku serok û pêşevanên Kurd heta vi zemani dezgeyên xwe yê xudmuktariya

navçeyî temam kirîbin, ku ji alî me va hatîbin qezenckirin û ku rayên xwe eşekere kirin, di vê êlan bîkin ku jixwe xwediyê mafê çarenûsî ne û amadeyî jiyana bin hukmê Meclisa Miletê Mezîna a Tirkîyê bin. Ji bo ku hemû xebatên Kurdistanê berê xwe bide armanca vê siyaseta berpîrsiyariya Femandariya Eniya Elcezîre ye.

3- Di vê bête merheleyek wisa ku di Kurdistanê da Kurd li hember Fransîzan û bî taybetî ji, di sînarê Iraqê da li hember Îngîlîzan dijminatîya xwe bî şerê çekdari nebîn berbî guhartîneki û pêşiya yekitiya biyanî û Kurdan bête birin, di vê gav bî gav sedemên sazîrîna xudmuktariyên navçeyî bête pêşandin û bî vi awayî ji, bî me va bêne grêdan, di idarên milki da wezîfedana serokên Kurdan, bî me va qewîrkîrîna pevgrêdana wan û xe-

tên gîştî yê wê hatîne qebûlkirin.

4- Siyaseta Kurdistan ya hundirî wê ji alî Femandariya Eniya Elcezîre va bigîhê hev û idarekîrin. Femandariya eniyê di vi wari da bî Serokatiya Meclisa Miletê Mezîna ra dîde û distîne. Ji ber ku xeta tevgera wilayetan wê bête sererastkîrin û bigîhê hev, di vi wari da berpîrsiyarên memûrên milki ji, grêdayî Femandariya Eniyê ye.

5- Eger Femandariya Eniya Elcezîre, ji alî idarî û dadî (edlî) yan ji malî va guhartî û sererastkîrîneki pêwîst bîbine, bî ci anîna viya ji hukumetê ra pêşniyar dîke. Ji Femandarê Eniya Elcezîre- Tuxgeneral Nîhad Paşa ra.

Xusûsî ji şexîs ra ye.

Ji alî Heyeta Wekilên Meclisa Miletê Mezîna va bî awakî xusûsî ev talimata, ku di derheqa Kurdistanê da ye, hatiye sererastkîrin û wek li jorê ye tê agahdarkîrin.

Serokê Meclisa Miletê Mezîna  
Mustefa Kemal

Em bawer dîkin dema ku xwendevanên me çav bî vê belgê bîkevin wê ecêbmayî nemînin. Lewra yê ku siyaseta M.Kemal û hukumetên dewleta kolonyalist naskirîbe, wê bîzanibe ku ne M.Kemal ne ji hukumetên piştî



wi tucar aligriya xudmuxtariyê nekırme û daxwaziyên weha ji, bî xwinê fetisandine. Lê ev talimatname han ji bo çî û bî çî armançî ji Fermandarê Elcezire ra (Kurdistan) hatiye şandin? Sedemê hewcedariya talimatnameki weha çî bû? Bersiva van pirsan girêdayi rewşa wê demê ye.

Dî dema şerê rızgariya Tirkîyê da M.Kemal û çend "ronakbir"ên nijadperest, ji bo stendina piştigriya gelê Tirk û Kurd siyasetek durû dîdomandin. Wê demê ideolojiya Jontirki zêde xurt nin bû, ji ber vê yekê ji M.Kemal û jontirkên dora wi, libasê ummetperestiyê, mısılmaniyê lî xwe dîkırin û bî vi awayi lî piştigriya gelan dîgeriyan.

Wek tê zanin, dî sala 1920'an da Peymana Sevrê hatibû qebûlkırın. Ev peyman dî navbera hukumeta Osmani û dewletên mutefiq da hatibû imzekırın. Lî gor vê peymanê, gere Kurdistan û Ermenistanek serbixwe bîhata sazıkırın (madde: 62, 63, 64). M. Kemal, ji aliki va soz û bextê mafên netewi dîda Kurdan, lê bî vî siyasetê ra ji taktika ewiqandimê dîdomand. Lewra ew, xwedi bir û baweriya heqdayina mafên çarenûsi nin bû û bî hışkayi lî dij bû, lê wê demê nıkaribû ev dîtina nijadperest eşkere bıkıra. Dıgel vî siyasetê, bî dek û dolav êrişên sergirtî dıçû ser komel, rêxıstın û cemiyetên Kurd û dî vî wari da bî talimatnameyên veşari bala waliyan bî ser welatperwerên Kurd va dîhate kışandin.

Dema ku ji alî Kurdan va mafên netewi dîhate xwestın, M. Kemal, mesela Ermeniyân dîda pêşiya pêşevanên Kurd û weha dıgot: "Mafên we yênetewi heqe, lê hukumeta Osmani haziriya xwe dıke, ku Kurdistanê bîde Ermeniyân! Em hemû islamın û dıvê em rê nedın tıştêki weha." Mixabın ku gelek serokeşir, axa û pêşevanên Kurd, bî van

derew û propagandeyan dîhatın xapandın û bî dek û dolavên dewleta kolonyalist, berberiya navbera eşirên kurd dîhate xurtıkırın.

Lê pır neçû, rüyê Hukumeta Enqerê va nijadperest eşkere bû û ji bo pêkanina maddeyên Peymana Sevrê, ji nav gelê me dijayetiyekek xurt bilind bû. Mesela dî Payiza 1920'an da serokeşirên Dersimê, lî Hozatê lî hev civiyan û ji hukumeta Enqerê ra ev nama han verêkırın:

"1- Dıvê ji alî hukumeta M. Kemal va dîtinên wan yênetewi dî derheqa bıryara Hukumeta Saltanatê, ku xudmuxtariya Kurdistanê qebûl kıribûn, bête pêşandin.

### Talimat metni

Kurdistan hakkında Büyük Millet Meclisi Vekiller Heyetinin Elcezire Cephesi Kumandanlığına talimatdır.

1. Tedricen bütün memlekette ve vasi mülkyata doğrudan doğruya halk tabakalarının ilgilisi ve müstemsir olduğu surette idareci mahalliyeler ihdası siyaseti dahilîyemiz içindedir. Kürtlerle meskûn menâzıkta ise hem siyaseti dahilîyemiz ve hem de siyaseti hariçiyemiz noktası nazırından tedricen mahallî bir idare ihdasını ilzâm - emekleyiz.

2. Mülklerin kendi mukadderatlarını bizzat idare etmeleri hakkı bütün dünyada kabul olunmuş bir prensiptir. Biz de bu prensibi kabul etmişizdir. Tahmin olunduğuna göre Kürtlerin bu zamana kadar idareci mahalliyeye ait teşkilatlarını kılâf etmiş ve ruhsat ve mübahezâları bu gaye namına bizim tarafımızdan kazanılmıyış olması ve reylerini izhar ettikleri zaman kendi mukadderatlarına zâten sahip olduklarını Türkiye Büyük Millet Meclisi idaresinde yaşamaya talib olduklarını ilân etmelidir. Kürdistan'daki bütün meselelerin bu gayeye müstemsir siyasete tevcihi Elcezire Cephesi Kumandanlığına aittir.

3. Kürdistan'da Kürtlerin Fransızlar ve tahsilen Irak hududunda İngilizlere karşı husumetini muvâzâh müademe ile gayri kabulî tadîl bir dereceye vâdirmek ve enoniblerle Kürtlerin itilâfına mani olmak, tedricen mahallî idareler teşisi ezubunî izhar etmek ve bu suretle kalben bize merbutiyetlerini temin etmek. Kurt rühasasının, mülki ve askeri makamlarla tavzif ederek, bize merbutiyetlerini tarin etmek gibi husutu umumiyeye kabul olunmuştur.

4. Kürdistan siyaseti dahilîyesi Elcezire Cephesi Kumandanlığı tarafından tevhid ve idare edilecektir. Cephe Kumandanlığı bu bapta Büyük Millet Meclisi Riyaseti ile muhabere eder. Vilâyetler tarafından talep oluncak hâttî hareketi tanzim ve tevhid edecek olan rühasayı memurını mülkiyetini bu hususta mercii de cephe Kumandanlığıdır.

5. Elcezire cephe Kumandanlığı, idari ve adli veza mali tadilat ve idâhata lüzum görüldüğü bunların talîhîni hükûmete teklif eder.

Elcezire cephesi Kumandanı Melika Nâzîd Paşa Hazretlerine.

Zata mahsusur.

Büyük Millet Meclisi Vekiller Heyeti tarafından zâti devletlerine mahsus olmak üzere Kürdistan hakkında tanzim edilen talimat bercebi, bîhâ tebliğ olunur.

Büyük Millet Meclisi Reisi  
Mustafa Kemal

### Bugünkü Türkçesi

Kürdistan hakkında Büyük Millet Meclisi Vekiller Heyeti'nin Elcezire Cephesi Kumandanlığı'na talimatdır.

1. Adım adım bütün memlekette ve geniş ölçüde doğrudan doğruya halk tabakalarının ilgilisi ve etkili olduğu mahallî idareler kurulması için siyasetimizin gereğidir. Kürtlerin oturduğu bölgelerde ise hem iç siyasetimiz ve hem de dış siyasetimiz açısından adım adım mahallî bir idare kurulmasını gerekli bulmaktayız.

2. Milletlerin kendi kaderlerini kendilerinin idare etmeleri hakkı, bütün dünyada kabul olunmuş bir prensiptir. Biz de bu prensibi kabul etmişizdir. Tahmin olunduğuna göre, Kürtlerin bu zamana kadar mahallî idareye ait teşkilatlarını tamamlamış reisler ve ileri gelenleri bu amaç adına bizim tarafımızdan kazanılmış olması ve reylerini açıklamadıkları zaman, kendi kaderlerine zâten sahip olduklarını, Türkiye Büyük Millet Meclisi idaresinde yaşamaya talip olduklarını ilân etmelidir. Kürdistan'daki bütün çalışmaların bu amaca dayanan siyasete yönelmesi Elcezire Cephesi Kumandanlığı'na aittir.

3. Kürdistan'da Kürtlerin Fransızlar ve özellikle Irak sınırında İngilizlere karşı düşmanlığını silahlı çarpışmayla değiştirilemeyecek bir dereceye vâdirmek ve yabancılarla Kürtlerin birleşmesine engel olmak, adım adım mahallî idareler kurulması sebeplerini açıklamak ve böylece bize yürekten bağlanmalarını sağlamak, Kürt reislerinin, mülki ve askeri makamlarla görevlendirerek, bize bağlanmalarını sağlamlaştırmak gibi genel çizgiler kabul olunmuştur.

4. Kürdistan iç siyaseti Elcezire Cephesi Kumandanlığı tarafından birleştirilecek ve idare edilecektir. Cephe Kumandanlığı bu konuda Büyük Millet Meclisi Başkanlığı'yla haberleşir. Vilâyetler tarafından izlenecek hareket çizgisini düzenleyecek ve birleştireceğinden mülki memurların yöneticilerinin bu husustaki mercii de cephe Kumandanlığıdır.

5. Elcezire Cephe Kumandanlığı, idari ve adli veya mali değişiklikler ve düzeltmeye gerek görüldüğü, bunun uygulanmasını hükûmete önerir. Elcezire Cephesi Kumandanı Tuğgeneral Nihad Paşa Hazretlerine.

Kişiyê özeldir.

Büyük Millet Meclisi Vekiller Heyeti tarafından zâti devletlerine özel olmak üzere Kürdistan hakkında düzenlenen talimat yukarıda olduğu gibi bildirilir.

Büyük Millet Meclisi Reisi  
Mustafa Kemal

30-38 Eylül 1927

2- Dî derheqa idara xudmuxtariya Kurdistanê da dîtinên hukumeta M.Kemal çiyê? Dersimî ecele bersivê dıxwazın.

3- Dıvê gırtiyên Kurd yênetewi dî gırtigehên Elaziz, Meletye, Erzincan û Sêwasê da ne, berhal bêne berdan.

4- Dıvê mifrezên ku berbi mıntıqa Koçgiriye va hatine şandin derhal bêne veğerandin." (15'ê Çiriya Paşin 1920).

Lî ser vî daxwaziyê hukumeta Enqerê, ji bo nermkırina Dersimiyân heyetek dışine Dersimê û dî derheqa vî daxwaziyê da, dîtinên xwe yênetewi qebûlkırinê (!) pêşkêş dıkın û bî vî awayi lî ewiqandimê dıcadının. Lê Dersimî,



beri heyeta M. Kemal dıdın û ji Elazizê ev têla han dıdın Enqere:

"Lı gor Peymana Sevrê, pêwist e ku li Diyarbekır, Elaziz, Wan û Bedlisê Kurdistanek serbixwe saz bibe; dwê evya bête pêkanin; eger pêk neyê, em, eşkere dıkn ku emê mecbûri destavêtina çek bın û vi heqî bî zora çek bistin." (25'ê Teşrîni Sanî 1336, imze: Heyeta Serokeşirên Dersim a Xerbi).

Hukumeta Enqerê, ji aliki va esker sewqî Koçgiriye dıkn, ji aliki va Dersimiyan diwıqand û ji aliki va ji, hınêk serokeşirên Dersimê bî fen dıqşand ba xwe û wana wek mebusên Dersimê, tevi meclisa Enqerê dıkn (Meço Axa, Diyab Axa, Serokê Şuhba Eskeri Mistefayê Dersimi, Ehmed Ramiz, Hesen Xeyri). Ê bî vi hawê propagandeyek hate belavkırın, ku Meclisa Enqerê hım Tırkan hım ji Kurdan temsil dıke. Lê Seyid Rıza, bî van derew û propagandeyan bawer nekır; Elazizê zeft kır û têlek da Enqerê. Bî vê têlê dıda xuyakırın, ku ew mebusên Enqerê nıkarın Dersimê temsil bıkn; Dersimi Kurdistanek serbixwe dıxwazın û eger ev daxwaziyên wanyên netewi bête qebûlkırın, encax bî vê şertê ew, dıkarın wek konfederasyoneki bî Enqerê ra hevalbendi bıkn.

Dûra dı 1921'an da li Koçgiriye serhıldan çêbû, lê mıxabın ev serhıldan bî xwinê hate fetisandın û bî hezaran Kurd hatın kuştın.

Ev babetên jor eşkere dıke, ku wê demê rewşa dewleta kolonyalist ne baş bû, ji şer nû derketıbû û nıkarıbû dı careki da gelê Kurd bike hember xwe. Ji ber van sedeman, ev talimatnama xudmuxtariye ji, parçeyek ji plana siyaseta wê demê bû. Yani, ji EWIQANDINÊ pêştır tışteknın bû.

## 2- WEZİFE:

*Alikarê Fermandariya İdara Urfi ya Dersimê; ji bo kışkırin û rêçajotina mirovê rêxistinê en dabeşkar û xerabkar, bî armanca ajotina zerpa ser mirovê rêxistinê, GIRTIN û KUŞTINAWAN; ji 11'ê Çuleya Pêşin - 1985'an pêva li mıntıqa Ç/C MAH. wê kiryara keşif û keminê pêk bine.*

## 3- PÊKANİN:

*Bî armanca GIRTIN û KUŞTINA mirovê rêxistinê yên dabeşkar û xerabkar wê kiryara 6 saetan (01.00 - 07.00) ya keşif û keminê pêk bine.*

*Osman Çitim  
Tuxgeneral*

*J. Komd. Tuxay*

*K. û Alikarê K. SYNT*

## 2- WEZİFE:

*Alikarê Fermandariya İdara Urfi ya Dersimê; ji bo kışkırin û rêçajotina mirovê rêxistinê en xerabkar û dabeşkar, bî armanca GIRTIN û KUŞTINÊ ji 17'ê Sibatê - 1986'an pêva wê li mıntıqa AKYUNLU (ÇANTÜR) kiryara keşif û keminê pêk bine*

## 3- PÊKANİN:

*a- Plana tevgerê:*

*Bî armanca GIRTIN û KUŞTINA mirovê rêxistinê yên xerabkar û dabeşkar wê dı navbera (01.00 - 07.00) da kiryara keşif û keminê bête pêkanin.*

*Ev wezifa han wê Fermandariya Hêza Komando 1., ji ya 5. pêk bine.*

*Osman Çitim  
Tuxgeneral*

*Fermandarê Tuxayê.*

Ev belgeya han dı kovara "İkibine Dogru" da hate weşandın. Bê şırovekırın ev belge, nımüneyeki barbariye ye. Belge ji ali Ast. Umit Zileli va tê pêşandın û Umit Zileli, serpehatiya xwe ya Kurdistanê û hovitiya ku li ser gelê Kurd tê ajotin, tine zıman. Dema ku mirov ev pêşandına han dıxweyne, şerê navbera du welatan tê pêş çavan. Lê tıştık heye ku, ev şer, şerek ne êlankiri ye û êrişek yek ali ye li hember gelê me.

Dewleta kolonyalist - nijadperest, tevi ewqas belge û tıştên berbiçav xwe li xışimi datine, van belgeyan inkar dıke û bê fedî berpirsiyarên van barbariyan diparêze.

Ev ji, wek bî sedan minakên dın, car dın nişan dıde ku, dewleta xwinrêj, tucar xwe nêzi heqdayina mafên netewi nekiriye û iro ji, siyaseta qırkırına gelê me bî çavsori didomine.

Wek ku me li jor, dı şırovekırına belgeya xudmuxtariye da got; dema ku ev talimatnama xudmuxtariye ji ali M.Kemal va hate derxistin, armanca, ewıqandına Kurdan bû. Ji ber ku wê demê rewşa hukumeta M.Kemal ê nijadperest dest nedıda, ku raste rast mafê gelê Kurd bête inkarkırın. Kurd, demek hatın ewıqandın û piştı demeke kurt, siyaseta inkarkırinê destpê kır. Dı 1924'an da bî Qanûna Esasi, hemû kes Tırk hatın hesabandın û pêra ji, bî hoviti êriş, kuştın, talan û nefi hate ajotin. Hemû heyyiyên gelê me, lê hate qedexekırın û ev şoveni heta iro bê navbir tê domandın.

İro ji barbariya ku li Kurdistanê tê domandın parçeki ji siyaseta dewleta kolonyalist û Kemalizmê ye. Ji ber vê yekê, rewşa gelê me, do çı büye iro ji ew e.



# çend çarin

BARAN

Eger dogeh e an bihuşt e, çı heye lı vê dinê ye  
Hûriyên zer û sis, kevserên cure cure, çı bêji heye  
Lı dinêya dın çı heye ne kış e, xudê dızane  
Bomiyê meke, para xwe bistine, hin ku wext heye

\* \* \*

Qurna bist û yekan va hat, tu hin lı dema navçe dıji  
Xelk gıha stêran, tu hin hesabê qatê heftan dıki  
Mihemed rêber bû belê, berê wi ber bı pêş bû  
Lê tu vegeri qonaxa kevn, çend gav ji paş va dıçi

\* \* \*

Çavê te lı paş ın, dilê te lı dema navçe digere  
Oxra te bı xêrê be ,hevalo, destê me berde, here  
Xuya ye bihûšta me û te ne yek ın, bilezin  
Here lı şkeftan bijı, lı mêrgan biçêre

\* \* \*

Sersal e, jı ezman fişengên rengin dibarın  
Hela hela ye, ken û kêyf, xwarın û vexwarın  
Lê dilê mın lı wan geli û zozanan maye  
Ciyê agirê ser çıyan, andêrê, tu tışt nagırın

\* \* \*

Ne ax e ne bax e, kambaxê,tat û tır e  
Gul bajo gezo biçın, erdeki bê xêr e  
Bı hêviyek wala xwe mexapın, cotkaro!  
Here jı xwe ra lı zeviyek dın bigere



## sayi

Dest neke paşla xwe  
Stû xwar neke  
    Bê guman nini tu,

Ev ro,  
Roja iro  
Girtîye lî ser te ewrên reş,  
Kevîr - kuçîk  
Lî ser te war bûye,  
Pêşîya te, lî sıvderê  
Dest lî ser seri  
Mêr, bîra, pîsmam  
Pêşîya lullên sar  
Wek kela Bazidê rawestane

    Bî mîrînê ve  
    Destgirtîne ew,  
    Lê, bê hêvi nini tu,

Zıvîstan beri buharê tê  
Buhar e dû zıvîstan  
Şewqa sor û zer  
Nav tariyê dizê  
    Bê derman nini tu..

Xîrabi, hejari  
Toz - xûbar  
Ber bayê sibê direve  
Sayi dibe derdor  
Êdi her tişt xuyaye  
Mîna masiyê reş-belek  
Nav ava Munzur  
Azad dilize, dîgere,  
    Bê hêvi nînin em,  
    Pêşîya me çîk-sayi ye.

1985  
VAZGAL




(BONA 100 - SALIYA BÛYINA H.A.ORBELÎ)

**ulmdar û**

**bajarvanê**

**mezın**



Prof. Şekroyê MIHOYÎ  
Serwerê para Kurdzaniyê ya Înitututa  
Akademiya RSS Ermenistanê ya ulmên  
Rohilatvaniyê

Meriv hene, weki nav û şuxulê wan dîbine xemla dirokê, kubariya cîmaet û welata. Û çiqas zeman derbas dibe, ewqas mezınaya wan tê ber çavan. Orbeli ji wan merivan e. Bona ulmdarê mezın, wetenhız û internasyonalistê dîlsax û helal, tebiet gelekî merd û destvekîrî bûye. Bawerike pîr mezın heye, weki eger Orbeli iro bî me ra bûya û pîrs bîdana wi dî derheqa nîvis, jîyan û şuxulê wi da, ewi wê bigota: "Ez ne gazındar im". Ev îsbatiyên ku tînan bî xwe hesab dîbin şadetiya wê yekê. Ew sala 1887'a 8 (20) Adarê lî bajarê Kutaisiyê ji diya xwe bûye. Sala 1888'a mala Orbeliya tê Tîbilisê. Ev mal, maleke bî merifet û ittifaq bûye, lî vêderê jî kal - bava da qedrê xwendinê û ulmê zanîbûne.

Zarotiya xwe Hovsêp Orbeli dî Tîbilisê da derbaz kiriye. Û dibe ku evê yekê jî roleke ne çûk list dî nava nawenda hewasa Orbeli ya ulmî da, ku gelekî fire bû, bona wi û fikra wi ya ulmî ya zor û pîralî problemên gelek cîmaetên Rohilatê dîbûne objektên lêkolînê ya kûr. Lî vi bajarî ewi xeberdana gurcîkî û rûsî, ermenî û kurdi, ecemî û hurumî dîbihîst. Sala 1904'a Hovsêp Orbeli dî gimnasiya (Lise) Tîbilisê kuta kir. Hema wê salê jî Orbeli erza (daxwazname) xwe da Unîversîteta Peterburgê û ew hîldane fakulteta tarîxê - filologiyê (dî alî filologiya klasîkî da). Sala 1909'a ew bî qîmetên (pûan) bîlînd xwendina xwe kuta dîke û destbî xebata hazîrkîrîna disêrtasiya (têza doktora) xwe ya kandi-



datiyê dike. Sala 1911'a Hovsêp Orbeli bî serbesti intam (azmûn, imtihan) da û xwendina xwe pêşda bîr, usa ji li fakultêta rohilatzaniyê. Hêjayî û rûmete rohilatzaniyê li universitêta Peterburgê gelekî bilind bûn. Li vêderê ulmdarên ûrîsan yê nî nav û deng S. Jebelêv, M. Ros-tovsêv, F. Zelinski, V. Bêneşevîç û gelekên mayin ber serkaniya rohilatzaniyê bûn û bî saya wê yekê ew ulm zûtirêkê dibe dereceke (wareki) lêgerinê bî qedr-qimet, gelek cahilên (ciwanên) xudan şuret xwe pê dîgrîm. Pêşdaçuyî nî pêwendiyên Orbeli yê nî ulmî paşê bî merivne usa ra girêdayî bûne wek Îranist V. Jukovski, diroknasê Asiya Navin V. Bartold, sêmitolog P. Kokovsêv, pêşekzanê dirok û çanda Mîsrê B. Tûraêv û kutasiyê rohilatzanê bî nav û deng N. Mar. Wexta Orbeli hate Peterburgê N. Mar êdî ulmdareki bî nav û deng bû, hurmeta wî gelekî bilind bû wek ulmdar - rohilatzan. Bî serkariya N. Mar Orbeli, temamiya kursa zimanên Rohilatê derbaz bû (dî aliyê zimanên ermeni - gürciki-farîsî da). Orbeli bû komekdarê (alîkar) pêşin bona Mar dî nava xebata kolan-rêçgeriya Anîê da, ku çend sala kîşand. Van salên xebata lêkolîna ulmî, Orbeliyê xort çend mîqale û xebat neşîr kîr, ku idi wî çaxî dîdane kîvşê weki bî serê Orbeli rohilatzaniya ûrîsetê, ulmdareki xwe yê bî merifeta mezî nî dest anîye. Gelekî hêja nî fikrên Orbeli dî derheqa Anîê da, ku wî tarîxa wê nîvisîye û daye kîvşê, rol û kemala wî bajari dî nava diroka ermeni ya sedsalên navin da.

14 Tebaxê Orbeli tê bajarê Wanê û li vêderê bîryar dîde ku pêwîst e bî zaravê ermeniyên Moksê va mîjûl be. Ev qeza li başûrê Gola Wanê ya ku çaraliyê wê çîya ne. Orbeli bî siyari dîçe Moksê û ji mehekê zêdetîr li wîra dîmine. Li vêderê ermeni û kurd tevayî dîman. Li vîra dostiya Orbeli û Murtule begê Kurd destpê dike. Murtule beg ji wan serekên kurdan bû, ku rînd fem dîkîr nêt-merema siyaseta Roma xayî nî pêşda dîhat bona pîsmamtiya ermeniyân û kurdan. Murtule begê gelek malên ermeniyân -jin, zar, biçûk-mezî nî xezeba Romê xîlas kîriye. Ewî bî hîzkîrî nî xerîbdosti mîqatî Orbeli dîkîr. Orbeli, dî axîriyê da bî hîzkîrî nî şêkîrdari derheqa Murtule beg da nîvisîye. Li vêderê Orbeli xebîrnama zaravên ermeniyên Moksê hazîr dike. Bî wê ra tevayî ew folklor a ermeniyên Moksê berev dike. Sala 1912'a wextê çuyîna xwe ya cara dîda, ew wê xebata xwe kuta dike û ji bo hînbûna zîmanê kurdî û dî wî wî da lêkolî nî xebata xwe pêşda dîbe, ku ewî li Wanê destpê kîrîbû. Ewî xebîrnama (ferheng) kurdî saz kîr.

Erf-edetên ermeni û kurdên Moksê bandoreke gelekî mezî nî ser Orbeli hîştî nî. Qeyde - qanûnên mêvanqebûlkîrî nî, erf-edetên vêderê qîniyatên gelek hêja dane Orbeli bona fîkra rast hebe dî derheqa jîyana berê da. Çawa tê zanî nî, dî salên 1895 - 1896'an da diwana Sultan Hemîdê zulmê qîra gelek ermeniyân anî, dî nava vî şuxulê qîlêr da usa ji hîne axa, begên kurda hatî ne wergîrtî nî. Dî pey vê yekê ra Orbeli tê vê nehîya nava çîya û dîbine, weki çawa ermeni û kurd bî aşî - pîsmamti dî nava hev da dîjin, çawa erf-edetên wan mîna hev e, nêzîki hev e. Murtule beg bî xwe, bandoreke mezî nî ser Orbeli hîştîbû. Sala 1911'a, wî ji dê - bavê xwe ra dînvîsî: "Ez dî mala mudur da dîjim, begê kurda, yek ji wan gelek kurdan e, ku li pîşt a ermenîya sekî nî nî, wextê qîrkîrîna ermeniyân, merîveki ku gelekî mêla ûrîsa dike. Mî nî kalemêre usa xûnşîrî nî û bedew kê mî dîtîne. Ê ya sereke ew e, weki ew maqûl û bî merîfeta e, nenhêrî wê yekê (herçend jî) ew ji Wanê wêda neçûye tu cîyekî. Ew gelekî dî heyra mî nî da ye". Dî derheqa kurdên Moksê da, dî dîlovantîya wan da Hovsêp Orbeli bîranîneke gelekî xweş hîştîbû. "Li vêderê, li Moksê -dî axîriyê da gelek caran Orbeli dîgot- mî nî fam kîr, weki ne ku cîmaeta kurda, lê serwêriya (adminstrasiya) tîrka, ya ku ew berî ermeniyân dîdan, hesab dîbû dîjî nî nî ermeniyân yê xeter û li cîyên weha dîr, wek Moksê, kurd û ermeni bî pîsmamti bî hevra dîjin". Paşwextiyê Orbeli gelekî li ber xwe dîket û dîkewîrî, weki jî qîra sala 1915'a tenê çend malê ermeni xîlaz bûn, bîneliyên kurd jî hatî nî qîrkîrî nî, yê nî mayî nî jî revî nî û Moks dermdax bû. "Lema jî -Orbeli dînvîsî- tîştêki gelekî berkevî nî nî ye, weki ew, çî ku mî nî li Moksê nîvisîye-berevokê ne mezî nî, ya tekstan, ku ferhengên ermeni û kurdî ne- bawer bîkî nî hesab dîbî nî wek şadetiya paşî nî dî derheqa zîman, erf-edet, rabûn rûnîştandî nî, xebat û şabûna çend hezar ewladên herdu cîmaetan -ermenî û kurdan." Xebatên Orbeli yê nî wan sala heta roja îroyî nî jî, hesab dîbî nî wek dur-cewahîrê analîza ulmî, fikrên culet (wêrek, cesûr) û kîlîta gelek problemên ulmî yê nî lihevpiçîki (tevlîhev). Cîmaeta kurd û kurdzan şêkîrdarê ulmdarên mezî nî nî bona keda wî ya dî warê dirok û çanda kurda da. Mezî nî nî nî Orbeli, mezî nî nî wî ya merîvatîyê-bajarvanîyê, navê wî jî me ra dîkî nî nî nî nî wî hîzkîrî, nebîrkîrî. Ew gelekî mîjûl bû, xebata wî bêhesab bû, lê hîzkîrîna wî berbî kurdan û kurdzaniyê jî me ra bû kerem, ku îro destûrê dîde ku em li ser keda wî xebîrdî nî. Çend salan şînda dî pey hatîna



xwe ra ji Wanê, Orbeli usa ji bî zargotîn û zîmanê kurdan va mijûl bû. 4'ê Îlonê sala 1914'a serokê navça Peterburgê yê xwendinê nava nama xwe da dinivise: "... Anegori (lî gor) fikra wezîrê şuxulên der, ku hatiye gotin ministriya (wezîrtî) ronkaya cîmaetiyê ra, rê têra tê ditin lî fakultêta zîmanên Rohulatê ya Universitêta Peterburgê, zîmanê kurdi û etnografiya kurdi derbaz dibin". Bona miasekîrîna vê xebatê, wezîreta ronkaya cîmaetiyê navê Orbeli da. Çawa tê kîvşê, hema xût (sîrf) bona Orbeli û vi şuxulê wi N. Mar "Programa dersên etnografiya kurdan" hazîr kir. Paşê bî sîpartîna akademiya ûrîsetê (Rûsya) ya ulman, Orbeli, lî ser çêkîrîna ferhenga fransî - kurdi xebitî û tevi ferhenga Aleksander Jaba ya kurdi - fransî destbî neşîrkîrîna wê kir. Hema wan sala Orbeli tevi Ebdulrazaq Bedîrxan bî zîmanê kurdi va mijûl dibe û ew tîn ser wê fikrê, weki elifba latîni sazkin bona Kurda. Orbeli êdî wi çaxî nasiya xwe dîde efrandînen Ehmedê Xanî, ku dî paşwextiyê da ji wan ra hatine gotin xeberên wi yê dur-cewahîr: "Gava em lî ser cîmaetîya şayîr xebirdîdî, dî derheqa pevgîrêdana şayîr û cîmaeta (gel) wi da -sê mezinayi tîn ber çavê me- Firdewsiyê farîs (ecem), Rustevaliyê gurc û Ahmedê Xanî yê kurdi". Tevi N. Mar û ulmdarên mayî dî pey şoreşa Oktobê ra Orbeli emegeki pîr mezin rê, ji bo ku dî dewra teze da ulmê rohilatzaniyê pêşda bîbin. Serhatîya Orbeli û qedera xebata wi ya zanyarî û mezin û bêhesab dî nava kitêben mezin da ci dîgrîn, dîkarîna bîn ber çavan. Bona fikra tomerî (gîştî) em binne bîra xwe xebata wi dî hêla sazîrîna akademiya diroka çanda materiyaliyê, bîngêhdanîna weşanxana akademiya, cûre-guhastîna instituta Lazerev ya zîmanên Rohulatê, xebata wi lî Ermitajê, rêçgerîya (lêkolîn) ulmî dî derheqa hunermendî sasani da, sazîrîna para rohilatzaniyê. Meriv zendegirtî (heyret) dimîne weki çîqas hêz û merîfeta merîveki gotî hebe, ku ew bî serbestî serkariyê lî teşkîlkîrîna ulmê bîke lî ocaxeke usa mezin da, wek Ermitajê, û bî wê ra tevayî ewqas xebatan binivise, lî ser demeke here bilînd fikrên dur-cewahîrên kevnnebûyî bîhêle, ku hatîne nivîsin bona hobelyanên Firdewsî û Navoyî, Rustavelî û eposa (destan) Davîdê Sasûnê, weten û cîmaeta şêkîrdar emekê Orbeli dî aliyê ciguhastîna xezna Ermitajê, dî salên şerê weteniyê mezin da, dî dirokê da bî herfên zêrîn nivîsîne. Orbeli, temamiya jîyan û ruhê xwe danîbû rehîna vi şuxulê mezin.

Meha Nîsanê sala 1942'a Orbeli hate Erivanê

wek sedrê filiala Ermenîstanê ya akademiya TRSS ya ulman. Sala 1943'a akademiya Ermenîstanê ya ulma tê damezrandîna û Orbeli tê bîjartîna wek serkarê wê ê pêşîn.

Dî pey direktoriya Ermitajê ra Orbeli dibe dekanê fakultêta rohilatzaniyê lî universitêta Leningradê ya instituta akademiya TRSS ya ulmê rohilatzaniyê. Bî inîyatîva wi, lî vîra beşa kurdzaniyê hat teşkîlkîrîna û ulmdarê mezin bî xwe bû serokê wê ê pêşîn (bî xebata xwe ya esasî ra tevayî). Kurdzanên Leningradê: Qanatê Kurdo, Î. Sûkerman, M. Rudenko û yê mayî, bî serkariya Orbeli xebateke pîr granbîha kîrîna bona pêşdabîrîna pîrsên kurdzaniyê. Orbeli û şagîrtên wi xebateke gelekî mezin kîrîna bona hazîrkîrîna kadrên kurdzaniyê. Bî dehan cîwanên bî merîfet, lî vêderê hazîriya ulmî dest anîna û bûne pêşekzanên baş. Hêjayî biranîna ye, weki xên ji kurdên sovyetî lî vêderê xwendîna û hazîriya xwe stendîna, gelek kurdên dereke, yê ku bî şêkîrdarî dî derheqa emekê Orbeliyê mezin da dinivîsîn.

Orbeli ji wan merîvên nadîr e, ku ji wan ra bî heqî tê gotîna: "Ew bona merîva û cîmaetê hatîne dinê". Ew ewqas bî xerêqa teşkîlkîrîna ulm, alîkarîkîrîna kadrên ulmî ra mijûl dibû, weki gelek caran pêra nedîgîhand xebata xwe kutake, neşîrke. Xebateke wi ya usa granbîha dî wextê saxtîya wi da ronayî nedî. Gîlî dî derheqa encamên çûyîna wi ya Moksê da ne (salên 1911-1912'a), "Qîmyatên dî derheqa dialektolojiya kurdan û ermenîyan". Orbeli mexsûs dîda kîvşê, ku ev xebata yek û tam e, yanê parek bê para dîna nabe. Pêşekzan (zanyar, pêzan), vê xebatê gelekî bilînd bî qîmet dîkîna -ferhengên kurdi, ermenî. Eva xebata êdî hazîr e û zûtîrekê wê lî Erivanê ronahî bîbine (ango wê bête çapkirîna û belavkirîna).

Orbeli oratoreki (gotarbêj, xatîb) bêqûsûr bû, pîrê caran bê teksta nivîsandî xebardîda gotînen wi dî cîyê xwe da û bîjare bûn. Mala Orbeliyan rêçêke kîvş hiştîye dî nava dirokê da: Rûbên Orbeli, Lêvon Orbeli, Hovsêp Orbeli... Ewan navana bî rastî kubariya cîmaeta ermenîyan e. Lê bî qanûna dînyayê, her merîveki mezin dibe ewladê hemû cîmaetan ku wi bona wana emek rêtiyê, jêra xîzmet kîriye, sîfetê wan anîye meydana dînyayê. A maneyek ji ev e, weki navê Orbeli naveki ezîz û hîzkîriye bona cîmaeta kurdan.

*Ev nivîs ji rojnama "Rîya Teze", hejmarê 86'an (sala 1987) hatiye wergirtîna. Bî wergerandîna tipên latîni re, me zîmanê mîqalê lî gor şeweyê kovarê hêsan kir. Temamiya nivîsê ne ewqas e, lê me ji ber cih hînek jê kurt kir.*



# Jl FOLKLORÀ ME



## QEMERÊ

Lê qemerê qemerê lê  
Lê qemerê qemerê  
Sorê spiyê esmerê

Tu qemera Berazi lê  
Lê qemerê qemerê  
Bextê min ra tu b'nazi lê  
Lê qemerê qemerê  
Tu sê tışta j'min dixwazi lê  
Lê qemerê qemerê  
Kıl kılçı zêrê b'qazi lê  
Lê qemerê qemerê

Lê qemerê qemerê lê  
Lê qemerê qemerê  
Sorê spiyê esmerê

Tu qemera Sipiki lê  
Lê qemerê qemerê  
Tu b'guhara gupiki lê  
Lê qemerê qemerê  
Tu b'bazinê şırîki lê  
Lê qemerê qemerê  
Bextê min ra tu b'rîki lê  
Lê qemerê qemerê

Lê qemerê qemerê lê  
Lê qemerê qemerê  
Sorê spiyê esmerê

Berevkar:  
MÛRAD

Tu qemera Celali lê  
Lê qemerê qemerê  
Zêr û zivê zelali lê  
Lê qemerê qemerê  
Bextê min ra delali lê  
Lê qemerê qemerê  
J'min ra nabi bermali lê  
Lê qemerê qemerê

Lê qemerê qemerê lê  
Lê qemerê qemerê  
Sorê spiyê esmerê

Tu qemera Birûki lê  
Lê qemerê qemerê  
Kofiya te b'barê gaki lê  
Lê qemerê qemerê  
Sozê xwe da çirûki lê  
Lê qemerê qemerê  
Tu j'min ra malê naki  
Lê qemerê qemerê


Lê qemerê qemerê lê  
Lê qemerê qemerê  
Sorê spiyê esmerê

Tu qemera Hertoşi lê  
Lê qemerê qemerê  
Tu b'gustila bı qaşi lê  
Lê qemerê qemerê  
Zar şırini pırs-xweşi lê  
Lê qemerê qemerê  
Bextê min ra dıl-reşi lê  
Lê qemerê qemerê

Lê qemerê qemerê lê  
Lê qemerê qemerê  
Sorê spiyê esmerê

Tu qemera Heseni lê  
Lê qemerê qemerê  
Tu b'kempera zêr-hesini  
Lê qemerê qemerê  
Bextê min ra b'gazini lê  
Lê qemerê qemerê  
Tu çima b'min naseni lê  
Lê qemerê qemerê





# welat lı dilê min e

Çaxkanuş GALEMTERYAN

Karkera cawçêkirmê,  
Qehremana Keda Sosyalist

Jin hez dîkîm tîm emrê xwe biçûk nişandin. Ev qelsiyeke ku dikeve serê merivan; jî ber ku, hemû jin dixwazin tîm cîwan bin! Ez jî usa dikim, lê sedemên min cuda ne. Ez li welateki dûr hatîme dînyayê, li gundeki biçûk bi navê Kesap, li Sûriyê. Lê di sala 1947'an da hatîme Ermenistanê, erdê bav û kalê min. Hingê weki ez jî nu va jî diya xwe bûm. Ewsal, disa destpêka jiyaneke bextewar bû jî bo gelek merivên min ku piştî şer, di havina germ ya sala 1947 da li bajarê Batûmê jî keştiyekê hatim xwar. Jî wê vir da çil sal derbaz bûn û gelek tişt jî bira min çûne, gelek bûyerên girîng, lê hîstêrên şabûnê li çavên wan tucar jî bir nakim.

Me Ermenistan di xewnên xwe da ditî bû. Me ezmanê wê ê bi roj û ken, kolanên Yerewanê yê fireh, zinarên kevnare û çîrên biharê yê zelal li çiyayên wê ditim. Me gazîna welatê xwe yê berê tîm bihist. Û em gelek serbîlînd bûn bi hatîna vi welati, erdê wan mêrxasan ku zora Naziyan hov û har birî bûn.

Ez gelek cara tîm hîlbijartim bo serokatiye rêvebirîna cîvînan. Û kingê jî guhdariya gotaran bêzâr dîbim, êdi guhdari nakim û li rûyên welatîyên xwe dînhêrim: ew ki ne, maf û daxwazên wan wê çî be? Meriveki kal dîbinim bi pozzîniyek di çavên wi da; gelo ew jî kijan welati hati-



Çaxkanuş Galemteryan li  
karxanê, li ber dezgeyên xwe.



Timsalê mērxaseki Ermeni  
yê kevn, Dawidê Sasoni.



ye welatê bav û kalan? Gelek merivên nas dibinim: Ew jina ha li Îranê hatiye dinyayê, li wir ku jiyan bo wê gelek bî zor û zehmet bû; ew keça han ku ji min ra rûyê xwe yê bî ken nişan dide, ji malbateke macir e ku ji Lîbnanê hatme... Qedera van hemû mirovan usa ji hev cuda ye! Niha em hemû di vê salona ronak da ne û piştî kar û barê resmi, govendeke leyistikên gel wê dest pê bike, leyistikên Ermeniyên ku ji çarali dinê vegeyane hatme welatê bav û kalan.

Di demên usa da tim tê bira min gotinên xweşik yê nîvîskarê Ûris, Mikhail Koltsov, ku di sala 1924'an da Ermenistan diti bû. Hingê pêla pêşin ya welatîyên me yê nu gihîştî bû vir. Wi usa nîvîsandî bû: "Dîviya bû meriv bî Frensi xeberde bî Ermeniyê ji Parisê, listîkvanê trajediyê; bî Îngilîzi xeberde bî Ermeniyê ji New Yorkê, nîvîskarê romanî; û bî Elmani xeberde bî pîsporeki muzîkê ji Wîyanê. Her ji, ger meriv, qe nebe çend gotinê Tirkî ji tevlê bike çêtir e, bo xatîrê xudyê malê ku kasa sohbetê bî dilovani cardin tije dike. Li vir ji her welatî insan heye, vira ew ci ye ku hemû rê te dibin dîgîhinin cem hevalên Ermenî yê xebatkar.

Bî rastî ji, riya ku ez gîhandim Ermenistanê riya jiyanêke nu bû. Di zmanên Ermenî da gotinên nu xwe nişan dan: spurk - Ermeniyê ku li der hatiye dinê, welatîyê nu. Ev gotin di kaxîzên resmi da hatî bû nîvîsandim, lê di zmanê

xeberdanê da kê mî dîhate karanin. Li ciyê wê, gotina "bîra" bî kar dîhat ku dîlgermî nişan dîda.

Bî sedhezaran kes vegeyane welatê xwe. Her yek bî rêhiyet û ditîneke xweser dîhat, ku bî tesîra gelek tîştan çê bûbû, ehlaqê bûrjûvazî ji di nav da. Xeberdan, dan û stendîneke bî du alî ye: Ger dîxwazî xelk guhdariya te bike, tu ji guhdari bike. Bî vi awayî raya merivan derheqê rewşa dinyayê, bir û bawerî, weki gotina zaneyan, ji yekî derbazî yê din dibe. Dibe ku hertîşt ne go-ra mafê cîmaetê bin... Lê cîmaet di heqê van astengan da tê, ji bo xatîrê doza welatparêzî ya bilind, van hemû berên erda xwe li hev tine. Û em gelek mînetkar in ji bo rindî û comerdiya welatê me yê sosyalîst.

Bî sedan sal, gelê me jirî û jêhatbûna xwe di riya avakirî û xweşkirîna welatê beyanî bî kar anî. Bavê min hosteyekî baş bû. Piştî ku em vegeyane Ermenistanê, wi got: "Şukur ji Xwedê ra, êdî nah şunda emê malan li welatê xwe ava bikim û di aşîtiyê da bijin.

Ji 30 salan zêtir e ez li Yerewanê, li karxana îpegê di karê rêsandinê da dîxebîtim. Waxteki min 30 dezge bî hevra bî kar dîani. Ez bî dîlpakî nîkarim bêjim ku, çî ji destê min hat min şunda nehîşt. Niha nayê bîra kesî ku Çaxkanuş Galemteryan welatîyeke nu ye. Heya, ez bî xwe ji, hêdî hêdî ji bir dikim. Lê carcaran, ez bî serbî-



lindi dîfîkîrîm ku, jîneke xebatkar wek mîn ku jî Rojhûlata Navîn hatiye, niha tevi rêvebirina karên dewletê dibe: Ez nunereki Komcîvîna Partiya Komunist ya Ermenistanê me û her usa jî, ya Yekitiya Sowyet. Û wek endameke Sowyetê Bîlînd ya Ermenistanê, dî girtîna biryarên gelek giranbuha da para mîn heye. Niha cara sîsêyan e ku ez dî Konsêya Bajarê Yerewanê da ci dîgrîm. Ez, her usa jî, hîm endamê Komîta Partiya Komunist im, hîm jî dî komîta birêvebirina sendikayê da me, lî karxana ku ez tê da dîxebîtim. Xuyaye destê mîn tîjî ne. Û dîvê usa

bibe. Lî vîr Ermenistanê ez wek karkereke rê-sandîmê elîmîm. Vî welatî aşîti, xwebawerî, mal, heval, nav û nişan da mîn û pêşî lî ber mîn vekîr. Pîştî demekî, mîn fêmkîr ku, welatê mîn hemû YKSS (Yekitiya Komarên Sosyalîst yê Sowyet) e, "ta jî Moskow heya quncîkê herî dûr," û ez jî wê berpîrsiyar im, çawa welatê mîn jî mîn berpîrsiyar e.

Karxaneya ku ez tê da dîxebîtim, niha pavlikeyek nu çêkîriye û navê mîn lê danîne: "Çaxkanûş". Dezgeyên mîn her roj 1500 mêtro îpeg dirêsin ku jê 500 fîstan çêdîbîm. Xweş lî xwekî, hevalên mîni delal! ev pavlika nu hemû rengên Ermenîstana jiyanteze lî hev dîcîvîne. Ew bî rastî jî gora navê xwe ye: mana "Çaxkanûş"ê gulvedan e.

Me dî dawîya salên 1950'i da deynêkî demdirêjî dewletê girt û bavê mîn pê xaniyêkî mezin ava kir. Herçar birê mîn - Serop, Serkis, Andranik û Sedrak - tê da dîmînim û alîkariya hevdu dîkîm. Birê mîni biçûk dî sala 1948 da lî Yerewanê hat dînyayê. Ew dî karê metal da dîxebîte. Du birê mîn xwendegêha teknîkê xilas kirîm û niha dî karxanê da dîxebîtim. Andranik jî bo fîrînekê şofortî dîke. Hemû jî zewîcî ne û zarokên wan bî lez mezmî dîbîm. Kurê mîn êdî bûye xort, bo leşkerîyê navê wî xwendîm.

Ez çîma behsa van tiştan dîkîm û dî derheqa xîzmên xwe da ewqas dîpeyîvîm? Sedem ev e ku, dîxwazîm xelkî texmînî bike, rewşa me lî berîyên dûr, lî welatên Rojava yê sarî û lî ci û warên dîm çawa bîba.. Lî wan deran xelkî bî pîrani macîranî biçûkî dîbîne. Beyanîyêkî bê welatî bê-rûmet e. Mîn ev tiştî bî çavên xwe dîtiye.

Hêkyata jînikêkê tê bîra mîn, ku niha lî Yerewanê, lî pavlikeyê haletên gelek giranbuha dîxebîte. Hîm merîvên wê ku lî Fransê dîjin, gazi kirîm ku ew jî biçê wî welatî, Jînkî jî derketî çû jî bo jîyaneke hêsanî û çêtîrî.. Pîrî ne bori dîsa şunda hat. Û mîn jê pîrsî: "Lî wir rewş çawa ye?" Ev jî gotîna wê bû: "Qe mepîrs! Te caran

masîyê jî avê derketî lî ser erdê dîtiye? Ew çawa bê mecalî dîvê xwe lî vîrî û wê dîxe û dî warêkî beyanî da dîfetîse; ez jî lî Marseillesê usa bûm".

Merîvêkî bê welatî wek merîvêkî bê nav e. Ez gelekî zû tê gîhamî ku welatî ne tenê ew cî ye ku tu nanê xwe jê derdîxi û cîlên xweşîkî peyda dîki; welatî ew cî ye ku dîlê te lê ye. Ev kevîr, ev kevotî û ew sîya hêmkî dî bîmî pelgên wê yê ku dîxuşxuşîm, hemû parçeyekî mî jî welatê mîn.

Dî vî welatî da bî hezaran welatîyên nu dîxebîtim jî bo teze çêkîrîna warê me yê kevnî û jî bo avakîrîna xaniyên sorî sîyaxkîrî jî xwe ra. Lî Ermenîstana Sowyetî da gundî hene ku bî tevayî jî welatîyên nu pêkî tînen. Xelkî jî hemû welatînan vegerî hatî warê bavî û kalanî û niha lî vîrî bextewarîm.

Lî çarkoşeyê Ermenîstanê û Yekitiya Sowyetî welatîyên Ermenî yênu hene. Ew lî Çarîntsawanî haletên hesînî çêdîkîm, lî Kozakîstanê malanî ava dîkîm, lî Rojhûlata Dûrî sinorên Sowyetî dîparêzîm, dî Geliyên Araratê da rezanî datînim, dî gundên çîyê da lî nexwaşanî dîmîhêrî û dersê dîdîne zarokan. Dî navî wan da merîvên zêtîrî jêhatiî hene ku bî navî û dengî mî lî çarkoşeyê dînê. Wekî Oganês Çekîdzanî ku jî Îstembolê hatiye. Wî nişana Senetkarê Gelî ya YKSSî stendîye û hatiye hîlbîjartîm wek endamê Sowyetî Bîlîndî ya Ermenîstanê; Goarî Gasparîyanî, lî Mîsrê hatiye dînyayê; wê jî hîmî nişana Senetkarê Gelî ya YKSSî, hîmî jî nişana Qehremana Keda Sosyalîstî stendîye; û wênevânî Akopî Akopyanî, ew jî çendî salî berê jî Beyrûtê hatiye û Xelata Dewletê stendîye. Xebata hoste, hesînkî, madenkolî, zanaî û cotkarên me gurî û geşî dîbe û heyranîya dînyayê dîkîşîne ser xwe.

Hêza welatîkî bî xebatî gelê wê ya bî dîlî û canî ava dîbe.

Gava ez dî kolaneke Yerewanê da dîçîmî û tîmî, xweî û xwe dîbîm: "Va Kolana Leninî e, hevalekî mî lî vîrî rûdîmê. Lî alî dîmî Kûçeya Krasnoarmeyskayaî destî pê dîke; lî parkê kevnî da Teatra Sundukyanî û piçekî wê da film-teatra Rossîaî heye ku emî pîrî caranî dîçîmê. Gerî tu lî Zûkaka Abovyanî berî bî jorî biçî û vegerî alî çepê, tuyê bê Matenadaranî, çîyê ku destnîvisên kevnî, efrandîmên zanaî û nîvîskarên berê tînen parastîm. Evana hemû yê mînî inî û ez yê wanîm.

*Ev benda hanê jî kovara Sowyetî, Asia ande Africa - Today, jî hîjmara Îlonî û Çîriya Pêşînî, 1987 hatî girtî û jî çapa Îngîlîzî hatî wergerandî.*



# gotinên pêşiyar

Berevkar : SALIH

- \* Didanê jara li pelorê dişkê.
- \* Diranê kurmi, derman kêşan e.
- \* Destê dîza bî dîza nayê birrin
- \* Destê tenê rûyê mirov reş dike.
- \* Diyarîya şivani Helekok e.
- \* Dewsa xencerê qenc dibe, lê dewsa xeberê qenc nabe.
- \* Dizîk dîbêje beroşê rûteni (rû bî teni).
- \* Eger xweliyê li xwe diki xweliyeke germ.
- \* Eger bî mali, bî xalet û xal î.
- \* Geriyar derman e, qîsmet li ser piyan e.
- \* Giyayê hewşê tal e.
- \* Ga bî cila nayê naskirin.
- \* Jina bêkes har dibe, mêrê bêkes jar dibe.
- \* Mirîşkê hêk kiri ji xwe ra hevalex çê kiri.
- \* Bila rê be , bila dûr be.
- \* Postê hêştirê barê hêştirê ye.
- \* kotka tiji li ya vala mede.
- \* Çavê li deriya xweli li seriya.
- \* Aş şola xwe dike, çeq-çeqok dev û diranê xwe dişkêne.
- \* Xûn bî xûnê nayê şûştinê.
- \* Jin û mêrê şer kirin, nezanan bawer kirin.

## Dî Televizyona Hollandayê da Programa Kurdi

Dostên hêja,  
Dewletên ku Kurdistanê kirme kolonî, gelê me ji hemû mafên mirovî bêpar hiştine, zîman û çanda wi lê qedexe kirine.

Ev kiryarên han tişteki normal e. Lewra kolonyalist, ji bo ajotina kedxwari û hukmê kole-dariya koloniyar be ji, dev ji zordari bernadîn. Lê tişteki heye ku ne normal e, ew ji, kiryarên Ewrûpayîya ye —ku xwe wek pêşevanê mafên mirovî êlan dikin— ku bî siyaseta xwe dî parale-

la siyaseta kolonyalistan da dîçim û bî çaveki milleti yan ji netewî li gelê me nanêrîn (wek Tirkî, Ereban), mafên wan yêncîvî (sosyal) qebûl nakin (wek: bî zîmanê dayikê perwerde-gari, ji bo pîrsgrêkên civakî buroyên agahdari-yê, mafê radyo, televizyon û wd.) û xwe nêzi dayina van mafan nadîn. Lê parçeyek ji gelê me li Ewrûpayê wek karker, macîrên siyasî bî rîya komelên demokratî xebatek bê westan dajon û ji bo stendina van mafan dî berxwe didîn (xebata KOMKAR nîmûne ye).

Ji bo mafên demokratî, ku me li jor bî nav kir, li Hollandayê ji zûva xebat tê kirin. Bî sa-ya vê têkoşinê li Hollandayê, li bajarê "Den Haag" dî televizyonê da —ku ev televizyon me-hê carek ji bo biyaniyan programan diweşîne— mafê programa Kurdi ji hate qebûlkirin.

Her çiqas programa Kurdi kurt be (5 deqçe) û naveroka wê têr û tije nin be ji, stendina vî mafê han gaweke pêş e. Eger têkoşinek çalak bête ajotin, bîdestxistina hemû mafên demokra-tî mumkun e. Stendina mafê programa Kurdi dî televizyonê da, wek nîmûne giringiya têkoşin û xebatê dîde nişandan.

Bî silavên dostani  
Ş. Zîrav



# Şikefta

**Xebat**

## B1 Xwin

Kele-kela havinê bû. Şivanan pezê nivro anibûn mal. Nêziki kaniya gund lı bin dara tûyê çend gundi û mêvanek rûnişti bûn.

Mêvan İsmailê Qewoşê (İsmail Çawiş bû.) İsmail kaleki 60 sali bû. Navê gundê wi Riçık bû. Gundeki mezın û gurlax bû. İsmail dı salên biçûk da bavê xwe wında kırıbû, bı dest-lepa diya xwe hatıbû mezıncırın. Jı ber vê ew bı navê diya xwe dihate bangırın. "Çawişti" jı ber eskeriya tırkan jêra bibû paşnav. İsmail kaleki porpelaş, rûspi û devken bû. Xweş peyv bû. Xetên eniya wi, işareta tecuban bû. Hal-wextê wi ne xırab bû, ew û pirejına wi bı tenê dijiyan. İsmail çend caran zewıcibû jı, lê jê zarok çenedibû. Çer ku dihate gotın cendirman ew gullebaran kırıbûn, jı mırnê fıltıbû. Jı ber ku pır tırsiyabû zarok jê çenedibûn.

Jı cımaetê— jı ber çı bû nızanım, lê wi dest bı serboriyeke xwe kır: "Dı ser vê bûyerê ra gelek sal derbaz bûn lê disan jı, ew wısa bı germiti dı dil û bira mın da maye..."

Dı cih da xwe çêkır û bı tılıya xwe jı dırva işaret kır: "Ev çiya ye... Çiyayê Dızgûnê... Sala 1915'a jontırkan fermana Ermeniyân derxıstıbûn. Jı bo serê her Ermeniki 25 quruş danıbûn. Kuştına Ermeniyân bibû riya qazancê. İnsanân qımeta insanân nedızanın, bı qıreti siyaseta nijadperestan bı cih dıanin. Dı aliki da jı

bona ku erd û malê wan bıkeve destê feodalân Ermeni bı qıreti dıhatıne kuştın, gelekê wan jı reviyân dervayi welat. Welat bibû gola xwinê. Gelek bûk û keçên Ermeniyân bı dileki êş, bı darê zorê, bı cıranên islam ra zewıcın. Pıştı wındabûna gelê Ermeni, barê gelê Kurd gıranır bıbû. Jı ber ku gelek kar û barê gundiyan bı destê zen'etkarên Ermeniyân dıhate çêkırın. Û xelkê Kurd jı wan hazır dıgırt. Wek caw çêkırın, şal dırûtın, xılık û sepet çêkırın, hesıncari û hwd.

Jı aliki da pıştı ku Asûri û Ermeni dı welat da kêın bûn, bac(vêrgi) û eskeri bû para Kurdan. Serda jı şerê cıhanê domdıkr. Bac û eskeriya dırêj bibû zılmeke mezın. Saleke dın şında jontırkan bı êrişên eskeri careke dın ajotın ser Kurdên navça Dersimê. Gelê Dersimê lı ber vê hovıtiyê disa seri rakır. Kurdan Hozat, Mazgirt, Nazmiye û Pertek işxal kırın. Lê dı bın serokatiya Miralay Galatalı Şevket da gelek qetliamên mezın hatın çêkırın. Gund hatıne şewıtandın, jı û zarok hatıne kuştın. Pez û dewarên gundiyan bı zorê jê dihate stendın û jı bo wan tu bedêl nedıhate dayın. Jı ber van kırınên dijının herkesi jı cih û warê xwe bazdıda. Salê mın dora 15'a ya hebû yan tunebû. Me jı weke herkesi ceh û genımê xwe, erd veda û têda çal kır. Me tev pısmaman û cıraneki xwe tıfingên xwe gırt û me xwe da Çiyayê Dızgûnê. Jın û zarên me jı berbı Pertekê çûn. Hukumeta Tırk, jın û zar lı



Pertekê kom dikir ku paşê surgûni rojava Anatoliyê bike.

Çiyayê Dîzgûnê li hember Çiyayê Silbûsê ye. Çiyayeki serbilind û xemdil e. Li navbera Qızilkilis-Gêxi ye. Me ji helali û xatirê xwe xwast û di berbanga sibê da ketine rê, pîr hindik çûn dikê sibê bang kir. Di wê demê da ji tîrsa esker û xefiyan, rêçûyina şevê baştir bû. Em bi roj radizan bi şev ji rê diçûn. Me di çend şevan da xwe gihande Çiyayê Dîzgûn. Devê newalan û daristan bi zarok, jin û mêr tîji bûn. Hemû kesan xwe ji hevdu diparast.

Çiyayê Dîzgûnê geleki asê û bilind bû. Gelek teyr û tûr, mar û mûr diheband. Herwisa jin, zarok, pêşmerge û esker ji.

Wextê ku me xwe gihand wêderê, me xwe gelek azad û xurt hesiband. Lê me tiştêk nehesibandibû: Bêbextiya dijmin.

Me li wir ji xwe ra şikeftêk dit û em têda bi cih bûn. Siban zû me xwe piçek dîda ber rojê û dîkîşiyar cihê xwe. Carna bi dorê em dadiketî gundan ji bo xwarinê, hin tiştan berev bîkî. Gund wêrane bûn. Mehsûlê wan di zevi û bêderan da mabûn. Li der dorên wan gundan ew kesên ku xwe ji esker diparastî hebûn.

Rojekê em çar heval ji derketî pêşiya şikeftê, me xwe da ber rojê û spi ji xwe paqîj dîkîrîm. Dûra em ketine şikeftê. Roja din sibê şefeqê da em bi dengêki hîşiyar bûn. Li ser şikefta me, ji jorê "qırpe-qırp" dîhat. Wextê ku me xwe dabû ber tavê. eskeran ji dûrva li me mêze kiribûn û iro cihê me kîvş kiribûn.

Em rahiştî tîfîngên xwe û li benda wan sekînin. Bangî me kîrîm ka em kine û çend kesî ku teslimî wan bîbîm. Bapir bi navê me bersîva wan da. Me hemûyan ji zêde tîrkî nedîzanîm.

Dûra me gulle berî hev da. Çend kesan xwest bîkevîne şikeftê li nivê rê ke-

tîm. Ji bo wextekî kurt ew çend kesên kuştî li ber derê şikeftê ji me ra bûn kozîk(parêzgeh). Lê eskerên dijmin çend rojan û şevan li ber derê şikeftê nobet girtî û man. Bapir bi tenêya xwe geleki ew meşxûl kîrîm û zerar giyand wan. Fîşekên me ji li ber qedandîne bûn. Xwarî û vexwarî ji qet nemabû. Piştra Bapir hate lîxîstî, bîrayê wî yê bîçûk Weli Axa tîfînga wî girt, li dijmin gulle barand. Lê Bapir careke din ranebû. Me sê hevalan li ser meytê hevalê xwe, ti û bîrçî, bi tîrs û xof sê rojên din derbaz kîrîm. Gulleyên me ji qediyabûn. Esker ji ev yek famkîrîbûn. Wan li me gulle dibarandî. Cih li me pîr teng bîbû. Em sê heval ketîbûn quncîkekî teng.

Ez di cihê xwe da rûniştîbûm. Herdu hevalên min di ser min ra jîpê sekînbûn. Bi dengê tîfîngan ra tiştêki germ di ser min da bari. Herdu hevalên min di cih da ketîm. Li ser şalê min mêjî û xwîna wan belav bîbû. Ez di cihê xwe da ji xwe da ji xwe ceyîşîm. Dest li min sar bû, bîna min çîkiya. Dîlteng û bêçare bûm. Niha ez bi tena xwe mabûm. Di navbeyna min û mîrîne da bostek mabû.

Bi tîrs min bang kîr, teslim!.. Li benda min bûn ku derkevîm derva. Lê min cesaret nedîkîr. Paşê min bîryara xwe da û ji şikeftê derketîm. Çer ku derketîm eskeran xwe kîrîbûne talda kevîran. Min fîrsendek dit û serberjêr bazdam. Geleki pey min ketîm ez zeft nekîrîm. Çend satan şunda ji aliyê birlikeke din hatîme girtîm. Komutanê birlikê ifada min girt û çekê eskerî li min kîr û ez girtîme nav eskeran. piştî ku hereketa Galatalî Miralay Şevket Paşa kuta bû, xelkê me ji vegeyîya cih û warê xwe ê berê.

Lê bînketa milletê me tenê ji ber nezaniya me bû...

Hezar salî ji bîjim vê bûyerê tucaran nîkarîm ji birbîkîm."



## PÛŞKIN

\* Jî şayirên ûrîsan yê herî mezin  
Pûşkin e. Dî Ewrûpayê da jî şayi-  
reki wisa mezin tune.

H.TÛMANYAN

\* Ew kesê yekemîn bû, ku li ba  
me edebiyat gihandiye bîlîndaya  
xebata netewî.

N.G.ÇERNİŞEVSKI

\* Hetani roja iroyin tu kes jî  
Pûşkin derbaxîr nebûye, ne bî  
bedewîtiya helbestan, ne jî bî hê-  
za diyarkirina his û ramanan, hel-  
bestvanek, ku bûye pêşewayê  
edebiyata rûsî

M.GORKI



## Tava Helbesta Rûsî

Aleksander Sergêviç Pûşkin (1799 - 1839) şayirê ûrîsaiyî mîletiyê ê mezin e. Merivên zemanê wi ew bî nav dîkîrîn wek tava (roja) poezîa ûrîsa. "Ew ne tenê şayirê ûrîsa yê zemanê xwe yê mezin bû. -Belinski derheqê Pûşkin da nivîsiye, -lê usa jî şayirê hemû cîmaeta û hemû qurna yê mezin bû." Çawa Lomonosov hesab dîkîn himdarê ulmê ûrîsa, usa jî Pûşkin hesab dîkîn wek himdarê literatûra ûrîsa ya nû.

Efrandîna Pûşkin bû neynûka jiyana civata ûrîsa ya mîletiyê "ensiklopediya jiyana ûrîsa". Em dî nava efrandîna Pûşkin da temamiya jiya-

na ûrîseta wi çaxî, deb û pêwendiyên hemû sî-  
nîfên (çînên) mexluqetîya ûrîsa dîbinî, pê dî-  
hesîn, weki ewî çîqasî qedrê xwe li bêcerkîrîna  
temamiya xezna cîmaeta ûrîsa ya mîletiyê, ide-  
alên cîmaeta ûrîsa ya azadîyê û hemmerîvayê  
dîgîrt, dîkarîbû jîyan û kultura mîletên mayî  
fam bike.

Dî nava literatûra ûrîsa da şayirên mezin, ni-  
viskarên mezin, dramaturgên mezin gelek in.  
Xudanê "Evgeni Onegin" û "Syarê hespê sîfîr",  
"Baris Godûnov" û "Qîza Kapîtan", "Tragedî-  
yên biçûk" û çîroka hemû mecalên şayirîyê



efrand, dı nava bist çend salên xebata xwe ya literatûrê da bû him şayirê mezin, him niviskarê mezin, him ji dramaturgê mezin.

Aleksander Sergêviç Pûşkin genia(deha pêzan) bû geniaki gelekî mezin. Ew li ser mirata pêşiyên xwe yên literatûriyê yên hêja, poesiya cimaetê ya zar(zargotin) hin bû û bingehê literatûra rûsî ya nû dani. Lê ew bi kritiki(rexne) berbirri wê miratê dibû, çî ku kevn û nekêrhatî bû wêda davit, her tenê ew tiştê ku dî hêla diroki da bî keri pêşdabirina literatûra rûsî ya miletîyê dihat, wî ew tişt pêşda dibir, kûr dikir û dewlemend dikir. Û ew bû literatûreke usa, ku berk hejandina ûrîsa ya azadariyê ra hate girêdan, serecema wê ya mexlûqatiyê ya dewlemend hebû, dereca wê ya bedewtiyê bê hed û hesab bilind bû, pîrsgirêkên (problem) here girîng pêşda dikîşand û derecên jiyana wî çaxî yên cuda-cuda nişan dida.

Pûşkin, xasma ew niviskarên rûsî yên beri xwe û yên zemanê xwe gelekî bilind qîmet dikir, ku wî dî nav efrandinê wan da cimaeti didit.

Efrandina Pûşkin dî aliyê tematika û serecema xwe ya idêatiyê da niha dewlemend û pîralî ye. Zanina wî ya fireh hemû warên jiyana merîva û mexlûqatiyê bî hêzeke nebinayî va nişan da. Ew dî derheqa evintiyê da stra, temamiya wê ani ber çavan. Ewî pesnê hevaltiye û dostiyê da, qerfê xwe bî neyarên xwe kir -ji padşayê gurti heta niviskarê firoti. Ew dî derheqa weten-hiziyê da stra û li dijminê weten kire eynat. Ewî newekheviya cıvaki (sosyal) diyar kir û bû xemxurê merivên zêrandî û miletên bîndest... Tu dereceke jiyana merivatiyê ya usa tune, ku ew li ser nesekimibe. Tê bêji Pûşkin her tişt gotiye, ew ji bî hêz û bedewtike nebinayî va. Bî rasti ji ew "Destpêka hemû destpêkan bû" (Gorki).

Binyatê poesiya (helbest) Pûşkin wek ya cimaetê ye. Pûşkin li ser wê fikrê bû, weki gava literatûr dibe diyarkirê kultura cimaetê, hingê ew dibe literatûra cimaetê. Efrandariya Pûşkin her bî wî cureyî ye

Efrandina Pûşkin bî idêatiya bilind, humanizma mezin û demokratizma kûr va berbiçav e. Dî nava efrandinê wî da dengê weten-hiz-bajarvanê mezin tê bihistin ku bî alavî welat û cimaeta xwe hîz dîke, bî wan va serbilind û kubar dibê. Çıqası Pûşkin jî welat û cimaeta xwe hîz di-

kir, ewqasî jî ewî li qeyd û zînarê çarizmê kirîbû eynat. Ew qeydên koletiyê ku nedihîşt hêza cimaeta ûrîsa ya efrandiyê bî xurtî pêşda here. Ew wek dengbêjê azadiyê hate erafê meydanê. Jî efrandinên xwe yên pêşin da destpê kir, li dîji hukumeta Nikolayê Pêşin û qulixçiyên wî, mîlkdarên ûrîsa şer kir. Dî wî şeri da, hetani mirîna xwe jî Pûşkin nehate rayê.

Pêzaniya Pûşkin her tenê bî jiyana ûrîsa va nedihate sinorkirin. Hemû gelên Rûsyayê, usa jî cimaetên dînyayê yên mayin bî jiyana xwe va bûne babetê helbesta Pûşkin. Em dî nava efrandinên wî da Pîşkavkazê, Kavkaza Bakûr, kal-Kalmikiyê û Ûkrainayê, Fransayê û Hûnanistanê, Lehistanê û Hroma qedimî dîbinin. Ew efrandarekî pêşin bû ku nigarên (wêne, resim) merivên miletên mayin bî realisti nîrand.

Şayirê ûrîsai mezin usa jî bî heqî hesab dibê wek himdarê zîmanê rûsî yê literatûrî (edebî). Dî nava gelek qurna da, kitêbên ûrîsa bî zîmanê dêrê -Slavyani dihatin nivisandin, ku gelekî jî zîmanê rûsî yê cimaetiyê zend dîr bû. Lomonosovê mezin destpê kir zîmanê kitêba nêzîkî zîmanê cimaetê kir. Ev xebata ku Lomonosov dî warê zîman da destpê kir, Pûşkin kuta kir. "Dî nava helbestên wî da cara pêşin xeberdana ûrîsa ya zendi tê kîvşê" - Dobroliûbov nivisiye.

Pûşkin bû dersdarê gelek niviskarên ûrîsa. Ewî hukumeki gelek mezin çawa li ser şayir û niviskarên zemanê xwe, usa jî yên paşwextiyê hişt. "Pûşkin dersdarê me ye", L.Tolstoy gotiye.

Marks û Engels efrandinên Pûşkin bilind qîmet kirine. Pûşkin şayirê V.I.Lenin ê hîzkirî bû.

Pûşkin zûda jî hîdûdên ûrîsa yên miletîyê derketiye û bona temamiya merivatiya pêş, bûye serkaniya bedewtiyê ya mezin. Efrandinên Pûşkin bûne mîlkê temamiya merivatiya pêş û bî gelek zîmanên dînyayê hatine tercumekirin. Çawa dî welatê me da, usa jî li dervayî welatê me Pûşkin bî kurdi jî hatiye tercumekirin û neşirkirin.

Pûşkin nemiriye, herçend jî em iro 150 salî ya wefatbûna wî didin kîvşê. Çıqas dîçe navê wî, ewqasî geş û mezin dibe, surê poesiya wî ya nû ber çavê cimaetê tene kîvşê, dengê wî ewqasî qube û zîz tê bihistin.

**Emerikê SERDAR**

*Nivis ji "Riya Teze" hatiye wergirtin.*





ZAROK

# Çêlîka Pîsikê

TOLSTOY

*Wegerandin ji tirki: X. LEZGÎN*



Hebûye tunebûye, xwişk û birayek hebûne: Vasya û Katya. Pîsikeke wan ji hebûye. Rojêke baharê pîsîka wan jî ortê wînda bûye. Ev herdu xwişk û bira her derê geriyane, ew neditine. Pîsik tune, tune, tune.

Rojekê li hînda imbarê jî xwe ra leyistîne, hingê dibihîsîm ku jî jorê dengê zîrav tê. "Miyaw, miyaw". Vasya êdî qet disekîne, hema zûkava jî pêpelûka hîldi-

kîşe ser banê. Katya jî li jêrê maye û jî Vasya pîrsîye:

— Te dit? te dit?

Pêşiyê tu bersiv, tu deng jî Vasya derneketiye. Lê paşê xwe xwar kîriye û qir-yaye:

— Mîn dit! Vaye pîsîka me... Çêlikên wê jî hene, çiqas jî rîndîk in! Hela were, zû!

Katya hema bî lez çûye malê jî pîsikê



ra şir aniyê.

Tam pênc çêlikên pîsikê hebûne. Çaxê ku ew mezîn bûne, jî quncikê xwe derketine û li wan der û doran geriyane. Katya û Vasya yek jî nav wan hîlbijartine. Yeke belek; pêsiya wê sîpi, piştta wê gewr. Wan ew hildane birine malê.

Diya Vasya û Katya, ew çêlikên dîm jî li ciranên xwe belav kiriyê.

Herdu xwişk û bira bi çêlika mayî ra leyistine. Wan herdem zîkê wê têr kirine. Dema xewa wan hatiye bi hev ra raketîne, bi hev ra xew kirîne.

Rojekê jî rojan Katya û Vasya çûne bîndarûkê. Jî xwe ra leyistîne. Pîsik jî li ba wan bûye.

Dema ku bûye bager, pelên daran û toz tevlihev bûye. Pîsik di nav vê bagerê da, vi ali - wi ali çûye hatiye. Ev yek gelekî li wan xweş hatiye.

Demekê Vasya û Katya dînhêrîm ku li kêleka rê çiçek hene. Destpê kirîne ew berev kirîne. Bî berevkirîne ra pîsîka xwe jî bir kirîne.

Paşê jî nişkava qêrinek bihistîne:


— Xwe bîdîne aliyekî, jî pêşiya min derên ez dibêjim!

Nihêrine, yê ku diqire sîwarê hespeki ye, bi lez dajo ser wan. Du kûçîk jî li pêşiya wî bûne. Wan kûçîkan pîsik ditîne û êrişî wê kirîne. Pîsik jî qet jî cihê xwe neliviyaye. Hema wîsa xwe quncîloki kiriyê, piştta xwe kovandiye, li ber kûçîkan sekîniye. Bêje çîma narevî! Na, ma bêhîşê direve!

Dema ku çavên Katyayê bi kûçîkan ketiyê, kiriyê qêrîn, berê xwe daye malê û bazdaye. Lê Vasya zûkava xwe gîhandiyê pîsikê. Beri kûçîkan wî xwe gîhandiyê pîsikê. Xwe avitiye ser wê, ew jî êrişî kûçîkan parastiyê. Tam wê gavê ew sîwarê nêçîrvan xwe pêra gîhandiyê, kûçîkên xwe girtiyê çûye.

Vasya jî pîsîka xwe sax û sîlamet biriyê malê. Jî wê rojê şunda êdî tucar pîsîka xwe serbest, bê xwedî bernedaye rast û bestan.

### XAÇEPIRS







## "DİYARBAKIR 5 NOLU" – F. WELAT

Pirtûk belgeyeke granbîha ye ku dewraneki ji diroka gelê Kurd tine ber çavan. Ew 5 salên zindana Diyarbekirê, berxwedana şoreşger û welatparêzên Kurd li diji nazistên Tirk, wek belgeyeke diroki pêşkêşî diroka gelê me ya nîvisandi dîke.

Nîviskarê vê pirtûkê, şoreşgerê Kurd F. WELAT, bî serhatiyên xwe ra tevayî serhatiya hemû şoreşger û welathîzên Kurd şirove dîke. F. Welat dî binê çerxa faşîzmê ya êşkence û zulmê da çiqas camêr û egîr e; dî behskîrîna û şirovekîrîna xwe da ji ewqas nîviskarêki hosta ye. Ew dî behskîrîna bûyeran da gelek rastbîn e, wî çî ditiye, çî vejîyaye ew hemû li hafîza xwe nîvisîye; dî bîra xwe da hiştîye û paşê derbasî serkaxezî kirîye. Şirovekîrîna wî xurt e, carna nûansên psikolojîk jî dîde. Lê bî çavekî rastbîn... bêyî ku bûyeran jî rastîyan dîr bîxe. Dema tîrsîyaye "ez hîngê pîr tîrsîyam" dibêje. Ew, baş dîde xuyan ku berxwedana welathîzên Kurd, mezînahîya daxwaza gelê Kurd jî bo azadîyê, zora zulma dijîmîna dibe.

Pirtûk dî nav weşanên Riya Azadî da derketîye.



## "ÇİROKÊN KURDÎ" (Textes Kurdes) ROGER LESCOT

Pirtûka diplomat û rohilatnasê fransîz Roger LESCOT ya bî navê "Textes Kurdes", isal (1987), bî sernavê "Çirokên Kurdî" jî nû va, jî aliyê weşanxana Orfeus hat çapkirin. Dî pirtûkê da 5 çirokên kurdi yê zargotîni (folklorî) cih girtine.

## "MIRINA KALEKÎ RIND" - Mehmet UZUN

"Mîrina Kalekî Rînd" romana Mehmet Uzun ya duwemîn e. Weşanxana Orfeus li Stockholmê ew çapkîriye. Romana Uzun ya yekemîn "TU" jî dî sala 1985'an da li Swêdê hatîbû çapkirin.

## "HAWAR – Cild- 1" (Hejmar 1 – 9)

Hawar jî nû va hate weşandin. Neh hejmarên Hawarê (1 - 9) jî alî Mihemed Bekîr va hate tekuzkîrîna û wek cîld hate weşandin.

Xuyaye ku M.Bekîr karekî hêja bî ci anîye. Ew, ne tenê jî nû va weşandin, her wîsa nîvisên ku bî tipên erebî û farisî bûne jî, transkripteyî Kurdî -latîni kirîye û li gel orijînalên Hawarê, neh hejmar jî nûva hatiye sererastkirin (deqtilokîrîna).

Li gor agahdariya M.Bekîr, wê 22 hejmarên Hawarê yê mayîna dî sê cîldan da bête weşandin. Ev cîlda han (ku neh hejmar in) jî alî Weşanxana Hawarê hatiye weşandin.

## "JÎN" – Cild 4

Dî meha Çîriya Pêşîn 1987'an da Cîlda JÎN ya 4'an derçû.

Me dî hejmara 15'an (Roja Nû) da dî derheqê "JÎN"ê da bî kurtî agahdarî dabû. Heta nîha tevî cîlda 4'an, bîst hejmarên kovara Jin (her cîldê 5 hejmar) jî nûva hatîne çapkirin. Ev karê hêja jî alî M.Emin BOZARSLAN va hatiye kirin.



## " KOÇKİRİ DESTANI" – Cımşit MAR

Çawa tê zanin dı 50 saliya Serhıldana Dersimê da , lı ser tevgêrê gelek bend, mîqalê, broşur û pirtûk derketin û derdikevin. Van rojan bı navê "KOÇKİRİ DESTANI" pirtûkeke helbestan dı nav weşanên Özgürlük Yolu da derket. Dı vê berhemê da gelek helbestên hêja yê welatevini û şoreşgeri ci girtine. Niviskarê wê Cımşit MAR, helbestên xwe bı welathızike kûr û bı zanineke diroki ya fireh û bı ruheki têkoşer dımvise.

Dı dawiya sala 1987 an da pirtûkxana kurdi bı pirtûkeke lêkolînê dewlemendtir bû. Ev pirtûk dı nav weşanên KOMKAR'ê da hate weşandin. Niviskarê pirtûkê ROHAT, xuyaye ku gelek serê xwe eşandiye û lı ser diroka Kurdzaniyê (Kurdoloji) û xebatên derheqa wi, lêkolîneke hêja û kronolojik afirandiye.

Lı ser bingeha İlmê Kurdzaniyê xebatên ku dı derheqa Kurd û Kurdistanê da hatine kırım dı warê zıman, edebiyat, sınıt, tarix, arkeoloji, etnografya, etnoloji, ol, cografya, abori (ekonomi), sosyoloji, bibliyografya û wd. nın. Xebatên ku lı ser Kurdzaniyê hatine kırım, welat bı welat têtê nasandın û pêra ji, xebatên Kurdolog, niviskar, gernameyên gerokan û hwd. têtê nişandan.

Niviskar, tarixa peydabûna ilmê Kurdzaniyê ji 1787'an pêda qebûl dıke û ji bermayiya Maurizio GARZONI destpê dıke û tıne heta 1987'an. Lê pêra ji, çend gernameyan ji, dıde nasandın, wek: "Veğera dehhezaran – Ksenefon", "Gername – Ewliya Çelebi" û wd.

Dı warê Kurdzaniyê da (Kurdoloji) esera yekem ji ali Maurizio Garzoni va hatiye afirandın. Pirtûka M.Garzoni ya bı navê "Gramera Zımanê Kurdi û Ferhenga Wi", dused (200) sal berê dı sala 1787'an da lı Romayê (İtalya) hatiye weşandin. Lı gor niviskar, her çıqas dı sedsal 19 û 20'an da Kurdzanên hêja derketibın û ilmê Kurdzaniyê firehtır kırıbın ji, rêç û şaxa Kurdzaniyê bı Garzoni destpê dıke. Ev rastiya han ji ali gelek Kurdzanên navdar va ji, hatiye qebûlkırım.



## SERBORİYA 200 SALİ YA İLMÊ

### KURDZANIYÊ "


(1787-1987)

Niviskar, pêda dıçe û merheleya ku ilmê Kurdzaniyê gihıştiyê; eser û nivisarên ku hatine weşandin; zanyarên Rohilatnas û dıtmên wan bı kurti dıde nişandan.

Jı xeyni ev agahdariyên jorin, kar û xebata (dı warê Kurdnasi, edebiyat, folklor, tarix, siyasi û hwd.) pirtûk, kovar, rojname, nivisar û lêkolînên ku dı her çar parçên Kurdistanê da hatine û têtê weşandin têtê raxıstın. Dı dawiya pirtûkê da wêneyên çend kurdnas, zımanzan, edebiyatzan, tarixzan, lêkolınvanên sereke ji, hatine çapkırım.

Bı kurti pirtûk, ji bo niviskar, lêkolin û lêgerinvan, xwendekar, ronakbir, welatparêz û gel dıkare bıbe çavkaniyeke kronoloji ya eserên derheqa Kurd û Kurdistanê da.





Ey koleदार, dema tu hen ne h vr bu

Em h vr bu

Em cük bun, çiçek bun, mişev bun

Ey dağırkı

Beri tu peydabıbe

Sıran he bun bo erde

Bo biruska ste tan

Bo hulma de yan

Kemal Burkay